


# MIVOV ÇAWA DIKARE R'ÛP'ELÊN DÎROKÊ YÊN “WINDABÛYÎ” BIXWÎNE

“Û, ji bo ku dîrok werguhêrî demnû-  
sîya paradok'sên sedsalên navîn nebe, ji bo  
ku bûyerên dîrokî êdî wek ç'îrok-efsaneyan  
neyên xuyan, ji bo ku xwendevan bikaribe  
tê bigihîje, k'a bi r'astî di derbarê çî da tê  
vegotin, divê mirov tayê pêşk'evtina heş-  
mendî ya bûyerên dîrokî bibîne, û dema lê-  
gerînên zanistî xwe li serê wî tayî bigire  
û dîmenê dîroka wê serdemê yê r'êal û  
r'astî yek bi yek, derem bi derem vejîne”.

Ezîz ê Cewo Mamoyan

Dr. Îsmet Konak



Di hejmara 8-an a kovara “Kürd Araştırmaları Dergisi” (“Kovara lêgerînên k’urdî”, r’û. 35 – 45) gotara min a: “Rusça kaynaklar ışığında Medler” (“Ên med di ç’avkanîyên r’ûsan da”).

Wek ku ji sernivîsê bi xwe tê xuyan, gotar tişteki mîna boçûnek a berhemên zanistî yên nivîsk’ar-lêgerî-nerên R’ûsîyayê yên sedsala XIX – XX e, yên ku an berbi-r’î mijarên têk’ilîdarî Medyayê bûne, an jî berhemên wa-na bi t’evahîya xwe va di derbarê dîroka Medyayê û zer-deştîyê da bûne.

Helbet, t’ematîka medyayê ji bo min tşteki nû nine, di dema xwe da hevpeyvîna min a berfireh<sup>1</sup> bi xudanê p’irtûka “Zerdeşt Pêxember. Rûpelên dîroka “windabûyî”...”<sup>2</sup> Ezîz ê Cewo (Mamoyan) r’a hatye weşandin, û di wê da aspêktên cuda yên dîroka Medyayê û zerdeştî-yê bi giştî hatine nirxandin.

Piştî weşana gotara min a navborî, hinek xwendevanan bal k’işandibûn ser wê, ku danasîna berhemên dîrokzanên R’ûsîyayê bi giştî li hev hatye, ku ew zanîyar, ên ku di derbarê wan da hatye nivîsîn, bi r’astî jî k’arekî mezin pêk anîne, Lêbelê zanista dîrokî pêşdik’eve, û mirov divê ji hêlekê va ji k’arên wan ên zanistî r’a r’êz bigire, lê ji hêleke dinê va bi r’exneyî nêzîkî gelek dîtinên wan ên zanistî bibe. Xwendevan destnîşan dikin, ku, her çendî, gelek berhemên zanistî hene, lê heya îro jî di dîroka Medyayê û jînenîgarîya Zerdeşt P’êxember da gelek pirsên bê bersiv mane, ku dîroka pêkhatin û belavbûna zerdeştîyê bi binva mînanî ç’îrok û efsaneyên sedsalên navîn e. Xwendevan wisa jî dinivîsin, ku lêgerînerê k’urd ê r’êsiyayî Ezîz ê Cewo (Mamoyan), hîpo-t’êza di derbarê, qaşo, p’ewendîyên *hexemenîyan* bi zerdeştîyê û Avêstayê r’a hebûne, r’ed

<sup>1</sup> Îsmет Конак, “Зороастризм и мидяне (интервью)” – [https://www.academia.edu/68077406/Зороастризм\\_и\\_мидяне\\_%20интервью\\_](https://www.academia.edu/68077406/Зороастризм_и_мидяне_%20интервью_).

Ji vir û pêva wergera navên bîyanî yên berheman hûn dikarin di beşê “Ç’avkanî” da binihê-r’in, xwendevanên hêja – r’û. 20 – 21! – Wergêr.

<sup>2</sup> А. Д. Мамоян, “Пророк Заратустра. По страницам «потерянной» истории...”, [https://www.academia.edu/62069668/А\\_Д\\_МАМОЯН\\_ПРОРОК\\_ЗАРАТУШТРА\\_ПО\\_СТРАНИЦАМ\\_ПОТЕРЯННОЙ\\_ИСТОРИИ\\_](https://www.academia.edu/62069668/А_Д_МАМОЯН_ПРОРОК_ЗАРАТУШТРА_ПО_СТРАНИЦАМ_ПОТЕРЯННОЙ_ИСТОРИИ_); Ezîz ê Cewo, “Zerdeşt Pêxember. Rûpelên dîroka «windabûyî»...” – [https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT\\_PÊXEMBER\\_RÛPELÊN\\_DÎROKA\\_WINDABÛYÎ\\_](https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT_PÊXEMBER_RÛPELÊN_DÎROKA_WINDABÛYÎ_)

dike, û dipirsin, gelo me nikaribû di wê derbarê da bi hûrbînî binivîsya, ma ne, p'irtûka "Zerdeşt Pêxembr. Rûpelên dîroka "windabûyî"... a Ezîz ê Cewo (Mamoyan) bi t'evahîya xweva di derbarê wê mijarê da ye.

Bi r'astî ez bendê bûm, ku dê ji nava xwendevan helwestek r'û bide, lê li ser vê astê, min hêvî nedikir: wek ku tê xuyan, di nava civaka xwendevanên me da dijberaxêvên hêja (oponênt) hene, û mirovê bikaribe bi wan r'a her pisekê binirxîne û bighîje encaman.

Her t'enê ez dixazim li vira bidim zanîn, piştî ku min p'irtûka Ezîz ê Cewo xwend, evê mijarê p'ir' bala min k'îşand, û min destpêkir, gav bi gav hinek aspêktên vê mijarê binirxînim, ên ku di p'irtûka navborî da hene. Û, wek ku min êdî li jorê anî zimên, di sêrî da hev p'eyvîna min hate weşandin, û li wir me bi xudanê p'irtûkê r'a govekek a pîrsên di derbarê mijarê da nirxandin. Lê paşê, hê dereng gotara min a "Rusça kaynaklar ışığında Medler" ("Ên med di ç'avkanîyên r'ûsan da") derk'et r'onahîyê. Û di vê gotarê da min behsa wê kiribû, ku Ezîz ê Cewo nêr'îna di wê derbarê da r'ed dike, xwedêgiravî, *hexemenîyan* têk'îlîya xwe bi zedçerdeştîyê û Avêstayê r'a hebûne. Û xwendevanan jî destxweda helwesta xwe dan xuayn...

Lê naha, wek ku dibêjin, dema gotina r'astîyê pêr'a gihîştîye: di p'irtûka navborî ya Ezîz ê Cewo da di derbarê çî da tê gotin? – Eger mirov bi kurtî bibêje, ew di t'evahîya xwe da nirxandineke r'exneyî ye di derbarê wan hemûyan da, yên ku di nava 200 salên buhurî da di derbarê pêkhatin û belavbûna zerdeştîyê, Zerdeşt P'êxemberê Gewre û dîroka Medyayê da hatine nivîsîn...

P'irtûk di bin sernavê giştî ya "Awirek berbi cîhana kevnar va..." hatye wşandin.

Wê demê, k'a em jî binihêr'in, pîrs û pîrsgirêk di çî da ne...

Û, bi r'astî jî, di encama lêger'inên zanistî yên zanîyarên R'ûsîyayê û yên welatên dinê yên di derbarê pêkhatin û belavbûna zerdeştîyê û jînenîgarîya Zerdeşt P'êxember da, yên ku di nava t'evahîya 200 salên dawîyê da pêk hatine, nêr'înen cuda derk'etine holê, yên ku carna ne ku t'enê di navbera wan da, lê her weha di navbera wan û heşmendîya pêşvaçûnên bûyerên dîrokî bi xwe da nak'okî dertên holê.

Weha, mamosta Ezîz ê Cewo wan hemûyan di p'irtûka xwe ya navborî da çawa r'ave-dike: "... Bi dîtina lêger'îner û zanîyaran, di *P'irtûka Pîroz* – "*Avêstayê*" da jî hîç diyardeyek di derbarê bûyereke dîrokî da nîne, ya ku tê zanîn, û bikaribe anegorî demnûsîya dîroka cîhanê be (*kronologîyê*) ... Lêbelê, bi vêr'a, wisa jî didin zanîn, ku di "*Avêstayê*" da *hinek bûyer hene, yên ku dikaribûn bibûna destnîşana demê, mînak, t'ora gêneologî* ... Lêbelê, dibêjin, ku r'astîya wan jî bi guman e.

Îro di cîhana zanistê da çend şaxên jînenîgarîya *Zerdeşt P'êxember* hene. – Mamosta didomîne. – Anegorî yekê ji wana, *Zerdeşt P'êxember* li ser xaka Baktrîya dîrokî, li derdorên bajarê Belxê (Afxanistana îro) ji dêya xwe bûye. Anegorî yeke dinê, ew di R'adêsê da (p'er'ê bajarê T'ehrana îroyîn ê bi navê R'ay), an jî li r'ojhilatê Îrana mezin, hatye cîhanê, di navbera sedsala VI û nîveka yekem a sedsala V a berî serdema me da...

Zanyar-êntsoklopêdist û mitaledarê fars ê sedsala navîn El Bîrûnî (973 - 1048), anegorî agahîyên demnûsîya kevnêşopî (k'ronologî) ya p'ehlewîyan dihejmêre û tê ser wê dîtîne, ku *Zerdeşt P'êxember* 258 sal berî êrîşa Îskenderê Makêdonî a ser Îranê jîyaye...

Wisa jî dibêjin, ku di Gatan da di derbarê welatê *Zerdeşt* û *Kavî Viştaspa* da agahî nînin, ji ber ku guhdaran baş dizanibûne, gotin di derbarê k'îjan ewlatî da ye...

Tê gotin, ku bîrûbawerîya *Zerdeşt P'êxember* ji nivşekê derbazî yeke dinê bûye, ji hêla t'erefdarên wî va hatye pêşxistin û di govekeke berfirehtir da belav bûye. Lêbelê kevnêşopîyên dîrokî di gelek cîhan da hatine windakirin, lewra ku wê demê demnûsîyeke weke ya îroyîn nînbûye.

Di encamê da nêr'înen li ser pîrsa cîh û dema jidayîbûna *P'êxember* û herêma destpêkî ya belavbûna *zerdeştîyê* li hev nagirin.

Eger hinek dibêjin, ku bi misogerî dîyar nîne, k'a *Zerdeşt* k'engê jîyaye û erk'a xwe ya dirozgedarîyê pêk anîye, lêbelê hinekên dinê jî dibêjin, ku wî bîrûbawerîya xwe di hinek herêmên r'ojhilatê Îranê, di Asîya Navîn û Afxanistanê da belav kirye..." (r'û: 14 – 15).

Ango, di nava demajoyek a dusedsalî da hewqas nêr'înên dijberî hev û dijî heşmendîya pêvajoya dîrokî nivîsîne, ku bêyî dahûrandina (analîz) zanistî ya ciddî, mirov dijwar bikaribe bigihîje hinek encamên r'êal.

Û mamosta Ezîz ê Cewo lêger'înên xwe yên di vî warî da didomîne. Di destpêkê da ew wan r'ewş û mercên dîrokî dinirxîne, yên ku bûne sedem, ku ev p'ergala t'evlihev derê holê. Ew dinivîse, ku bi dîtina hinek lêger'îneran, qaşo, p'adşahê Baktrîyayê Gîstasp (Viştaspa) li Zerdest xwedî derk'etîye û destek daye, ku zerdestî di nava gel da belav bibe, lê bi dîtina hinekên dinê – xwedêgiravî, dema Zerdest P'êxembr li xakên bakûrê Dewleta farsan bê cîh û war li serê r'êyan bûye, serdarê wê yê bi navê Viştaspa anîye ser bawerîya xwe.

Û li vira mamosta weha matmayî dipirse: “Û hîç kesek napirse – ma, wê demê “Dewleta farsan” hebûye, gelo?”

Piştî'a ew nêr'înên dinê jî tîne, yên ku dibêjin, ku Zerdest di deverêke Bakûrê derîya Aralê, li Qazaxistanê û Tacîkistanê hatye cîhanê, lê hinek jî dibêjin, ku cîhê jidayîkbûna wî li Ûralê bûye.

Û, ev êdî derdorê du sedsalan e, – mamosta Ezîz ê Cewo gotina xwe t'omar dike, – zanîyar li ser pîrsa welatê Zerdest P'êxember û herêma belavbûna destpêkî ya bîrûbawerîya wî gengeşyan pêk tînin, lêbelê, piştî gengeşîyên demdirêj di cîhana zanistê da hatine ser wê nêr'înê, ku agahîyên di derbarê jînenîgarîya Zerdest P'êxember da p'ir' kêma in, di wan da nak'okî hene û pêbawerîya wana bi guman e, û, bi vî awahî, hejmartine, ku pîrs dawî bûye.

Lê, her çiqas ev hemû li holê ye, – ew gotina xwe didomîne, – bi dîtina hinek zanîyarên serdema me, û dîtînan wan jî ne bê bingeş in, dîsa jî, di nava agahîyên heyî da zanîyarîyek heye: *eger Zerdest P'êxember Avêsta dema desthilata hexemenêyan (piştî sala 550-yê ya berî serdema me) nivîsibûya, wê demê di P'irtûka Pîroz da dê di derbarê desthilatdarên wê bine-malê da agahî hebûna.*

Helbet, di derbarê vê pîrsê da ewqas nêr'în, pêşdîtin û r'amanên hinartî yên bi nak'ok û dijhev di ser hev da berev bûne, û ewana r'ewş wisa t'evlihev kirine, ku mirov nizanibû lêger'înên xwe ji çî destpê bike.

Bi dîtina mamosta, wisa tê xuyan, qey bibêjî, yekî bi zanebûn hemû diyarde wisa p'evguhar'tine, delîl wisa t'evlihev kirine, agahîyên dîrokî wisa lêpovajî kirine, ku ne pêkan be, mirov xwe bigihîne r'astîyan.

Di encamê da ew tê ser wê dîtîne, ku, ji bo lêger'înên zanistî di vî warî da bi serk'evtinî dawî bibin, divê mirov van pîrsên di r'êzê da bibersivîne:

1. *Ji bo ku r'ewşeke weha ya t'evlihev û bi nak'ok çî sersedemên dîrokî hebûne?*

2. *Mirov li ç'avkanî û ajoyên (motîv) p'eydabûna van nak'okîyan dikare li k'u biger'e?*

Û, ji bo ku wan hemû nêr'în û pêşdîtinan ji hev ver'esîne û vebijîre, ew bir'yar dike, di destpêkê da bizanibe, k'a îro çî li ber dest heye, û piştî'a, berê pêşin wan hemûyan beş bi beş di nava t'omerîyekê da bi heşmendî dahûrîne û binirxone...

Û weha, – ew destnîşan dike, ku di derbarê Zerdest da dinivîsin, xwedêgiravî:

– Di Gatan da ne di derbarê welatê Zerdest da, ne jî di derbarê welatê Kavî Viştaspa da agahî nînin, lewra ku ewan mirovana, yên ku Gat guhdar kirine, dizanibûne, k'a ew k'îjan welat e, ji bo wê jî pêdivî nînbûye, navê wî binivîsin...

– ew li ser erd û aqarên Baktrîya dîrokî, li derdorên bajarê Balxê (Afxanistana îro) hatye cîhanê;

– ew di R'adêsê da jîyaye (p'er'ê T'ehrana îroyîn ê bi nave R'ay)...;

– ew li r'ojhilatê Îrana mezin ji dêya xwe bûye (dewrên VI – V ên berî serdema me);

– ew di Îrana kevnar da jîyaye, ... an jî di Asîya Navîn da, ji derya Aralê berbi bakûr-r'ojhilatê va – li ser xakên Qazaxistan û Tacîkistana îroyîn...;

– ew li deverên derdorê ç'îyayên Ûralê hatye cîhanê, û heya hinek navên k'îlafeyên (xerabe) kevnebjayî Sîntaşta û Arkaîmê yên di herêma Çêlyabînskê ya Fêdêratsîona R'ûsîyayê da jî tînin...;

Wisa jî tê gotin, xwedêgiravî:

–mîrov nikare bibêje, k'a Zerdest k'engê û li k'u hatye

cîhanê û erk'a xwe ya p'ê-xemberîyê pêk anye;  
 –Zerdeşt bîrûbawerîya xwe di hinek herêmên r'ojhilatê Îranê da, di Asîya Navîn û Afxanistanê da belavkirye;  
 – p'adişahê Baktrîyayê (?! – E. C.) *Goştasp / Viştaspa* li wî xwedî derk'et ye û bi xwe jî destek daye belavkirina zerdeştîyê...;  
 – dema *Zerdeşt* wek p'enaberekî bê cîh û war û st'ar di herêmên bakûrê dewleta farsan da ger'yaye, ewî serdarê herêmê yê bi navê *Viştaspa* anye ser bawerîya xwe...;  
 ...Li ber ç'avan e, her çiqas di van nêr'înan da nak'okî hene, dîsa jî di wan da agahîyên balk'êş veşartî ne; û, her çiqas, ew agahîyana daneyên konkrêt destnîşan nakin jî, lê nepêkanîtiya agahîyên heyî bi xwe derdixin hole...

Û piştî ku mamosta Ezîz ê Cewo wan agahîyan hemberî hev dike û wan di nava t'omerîyekê da dadihûrîne, digihîje wê zanebûnê, ku di wan nêr'în, dîtî û şaxên serpêhatîyan da hîç tiştekî hevbeş nîne, yê ku wana bigihîne hev, û eger mirov pêbawerîya yekê ji wan bip'e-jirîne, ewê bê wat'eya r'edkirina yên dinê. Lewra jî dê ne r'ast be, eger mirov ewana di nava govekeke giştî da binirxîne.

Hem jî pîrs ji ber wê diwartir dibe, ku hema-hema hemû zanîyar lêger'ênên xwe li ser bingeha hinek agahîyên şewazî (formal) pêk tînin, ên ku ne ç'avkanî û ne jî motîvên p'eydabûna wana ne dîyar in, û mirov nikare bawerîya xwe bi wan bîne. Û eger mirov bi vî awayî pîrsê binirxîne, wê demê dê heşmendîya pêşk'etinên bûyerên dîrokî yên xwezayî bê t'er'i-bandin, an jî ew pêşk'etin bi xwe dê di sîyê da bimînin...

Û, ji bo ku wê berbenda bi dest (sûnî) hinartî bert'eref bike, mamosta bi r'êya dahûrandina (analîz) hemberhevkerinî ya agahîyên dîrokî yên di derbarê bûyerên wê demê da dest bi jinûva vesazandina (reconstruction) dîmenê pêşveçûna xwezayî ya pêvajoyên dîrokî dike, û bi wê jî hema r'êya r'astîn a lêger'înên danayên dîrokî yên wê serdemê û pêkanîna erk'a bawerîdarîyê ya Zerdeşt P'êxember dyar dike.

Dema lêger'înên zanistî nêr'îna r'ojhilatzanê navdar ê Î. M. Dyakonov a di derbarê wê r'ewşê da bala mamosta dikişîne: “... *Heya naha wê pîrsê ferz dîkin, k'a gelo ew peyker [“Avêsta”] di Medyayê da, an di devekeke Asîya Navîn da hatye nivîsîn. Herdû nêr'în jî, hem di nava zanîyarên sovêti, hem jî di nava yên welatên dinê da t'erefdarên xwe hene.*

Wisa jî pîrsa dema nivîsîna beşên kevînar ên “*Avêstayê*” bê bersîv dimîne. Hinek lêger'îner dibêjin, ku Zerdeşt (Zoroastr)... hevdemîyê bavê Darîûsê padşahê farsan *Viştaspê I e* (salên 522 – 485 berî s. m.). ...Hinek lêger'înerên dinê pêkhatina kevînantirîn beşên “*Avêstayê*” digihînin demên bêhtir kevn...”<sup>3</sup> – Û ew dibîne, ku ev gotinana dikarin gelek t'erefên vê pîrsê r'onî bikin.

D r'ewşêke weha ya ne sade da ew dahûrandina (analîz) zanistî-r'exneyî ya wan agahîyan pêk tîne, yên ku di ç'avkanîyên kevînar û yên sedsalên navîn da hatine p'arastin, û di encamê da digihîje wê nêr'înê, ku ew hemû ne anegorî heşmendîya pêşveçûna xwezayî ya bûyeran in, ne jî anegorî dîmenê giştî yê pêvajoyên dîrokî yên wê serdemê ne...

Û, dema ew van hemû nêr'în, pêşdîtî û şaxên serpêhatîyan dinirxîne, li bal wî pîrsek serî hiltîne: “*Ew çawa dikaribû wisa bibûya, ku di dewra VI a (berî s.m.) mirovek ji p'er'ê r'ojhilatê yê dewleta hexamenîyan (ji Qazaxistan, Tacîkistan an Afxanistana îroyîn) here-bigihîje “navçeyên bakûrî” yên wê dewletê, r'astî serdarê “wê deverê” bê, wî bîne ser bawerîya xwe, û peyr'a bi alîk'arî û pişgirîya wî, bîrûbawerîya xwe di t'evahîya Îrana mezin da belav bike?*” – Û bi xwe jî bersîva wê pîrsê dide, ku tiştekî wisa t'enê di ç'îrokên sedsalên navîn da dikaribûn pêk bihatana! Ma ne, ol ne eşyayekî navmalê ye (xal-xalîçe, p'arç'e an tiştên dinê yên r'ojhilatî), ku mirov bikaribûya li ser piştê deveyan, bi r'êya hermûş ji p'er'ekîdewleta gewre bibira bigihînda perê dinê, û bifirota.

Ma ne, ol şewazekî t'aybet ê hizir û bîrewarîya civakî ye, û hebûna wê bi t'omerîya hinek norm, dua-dirozge, bawerî, r'a û r'izmên olî û hevgerî û k'ombûna mirovan di civaka olî da dikare hebe... Û, ger mirov zimanê civakekê û r'abûn-r'ûniştin û kevneşopîyên wê

<sup>3</sup> И. М. Дьяконов, История Мидии, М. – Л., 1956, с. 50.

nizanibe, gelo dê bikaribe (*heya bi t'êorêtîkî*) wan hemûyan di jîyanê da pêk bîne? Û, ew jî, di nîveka hezarsala yekem a berî serdema me da!

Û, pirseke ne kêr girîng jî – serdarê herêmê (ew p'adişah be, an satrap, zêde ne girîng e!) çawa wisa bi hêsane derîyê mala xwe li ber p'enaberekî bê cî û st'ar vedike, ji wî r'a dostanîyê dike, û li wî xwedî derdik'eve, piştovanîya wî dike? Ma, gelo wê demê (lo, hema îro jî!), p'enaberên bê cî û st'ar, ger'okên sergedan dikaribûn wisa bi hêsane nêzîkî qesra padîşê bibûna, jixwe, tiştêkî wisa heya nikare bê ber heşê mirov jî, ku wê demê ewî p'enaberî heya bikaribûya derbazî hundur'ê hewşa qesra p'adişêh jî bibûya?

Û, piştî vê xudanê p'irtûkê dîyar dike, ku, eger mirov bi vê têgihiştina pîrsê li wan dîtîn, nêr'în û şaxên serpêhatyan binihêr'e û wan binirxîne, ew hemû dê wek holimaç'kên zar'okan ên bi hişkek'axeze (kartan) çêkirî li dû hev, yek bi yek li ser hevdu da hilweşîn, ...lewra ku, ew hemû hema di sêrî da li ser agahîyên hinartî, an jî daneyên lêpovajîkirî ji ber xwe derxistine.

Mamosta bi bawer e, ku bi hev guhar'tina daneyan û lêpovajîkirina zanîyarîyên dîrokî jî di wê herêmê da hê wê demê destpê bûne, dema *Quruşê* (*Quruşê II* ê dihatûyê) t'or'inê *Îştûvêgûyê* (*Astîagês*) p'adişahê *Medyayê*, bi malmezin û giregirên bijarte yên ner'azî û bi gazin, xeyîdî û nedilsoz va şer'ekî k'irêt li dijî p'adişê dadixin, bi xayîntî wî ji ser t'ext diavêjin û di welêt da desthilatdarîyê hiltînin destê xwe (sala 550î ya berî serdema me).<sup>4</sup>

Paşê ew balê dik'işîne ser wê, ku dema zanîyaran di warê dîroka gelên herêma erdnîgarî ya berfireh a bi navê Îran da lêger'în pêk anîne, di bin destê wan da t'enê agahîyên ç'avkanîyên farsan an ên farsîkirî hebûne (yên hexamenîyan, sasanîyan, p'ert'ewîyan û yên dinê), û beşê wan ê mezin li ser bingeha berhemên cihêr'eng ên zargotna gelêrî hatibûne nivîsîn, ên ku ji hêla "*dîroknûs*" – ç'îr'okbêjên qesra p'adişê va hatibûne hinartin û lewra jî, p'ir'ê caran gelek daneyên r'astîn ên dîrokî derî bala wan mane, û lêger'înên wana berovajî heşmendîya pêşveçûna xwezayî ya bûyerên dîrokî derk'etine.

... Kevneşopîyên weha yên çewt û ne durust, – ew didomîne, – îro jî bandora xwe li ser sazûna wat'eya sereke ya lêger'înên zanistî dihêlin... Ev mêtoda bûye r'êgeza "*zanistî*" ya dîroknûsîya fermî ya dewletên wek *Îranê*, *T'irkîyayê* û hinek welatên dinê yên ereban. Û heya gelek caran r'êbaz û armancên siyaseta evan dewletana hema li ser bingeha wan ç'îrokan tên sererastkirin.

Gelek nimûneyên *afrandinên* "*gelêrî*" yên vî r'engî yên farsan (wisa jî yên ereb û tirkî) ji hêla wan kesan va hatine hinartin, ên ku bi amadekirina "*zanista*" *dîrokî* ya wan welatan va mijûl bûne. Û di dema xwe da lêger'înên "*zanistî*" yên wek ewên navboro ji dîroknûsîya fermî ya wan dewletan r'a bûne bingehe, û îro r'eng û r'êbazên doktrîna siyaseta fermî ya wan dewletan dyar dikin. Di van welatan da bi hêsane agahoyên dîrokî lêpovajî dikin, daneyan diguhêr'în, mîrasiya çandî û dîrokî ya gelên dinê li ser xwe dinivîsin û, bi vî awayî, dîroka xwe li ser r'edkirina doroka gel û net'ewên dinê ava dikin. – Ew t'omar dike.

Lêbelê, xudanê p'irtûkê bi bawer e, ku her tişt bê şop wînda nebûye, ew "*agahîyana*", yên ku di dema xwe da ji hêla lêpok'aran (sextêk'ar) va hatibûne hinartin, paşê k'etine bingeha berhemên zanistî yên gelek lêger'înerên welatên dinê jî.

Û ew vê bi wê şîrove dike, ku dema hinek lêger'îneran weşanên zanista lêp (*pseudo-scientific*) xwendine, nikaribûne ji bo pîrsên r'ûdayî bersîvên nêzîkî r'astîyê bibînin.

An ewana ew hemû li şûna r'astîyê p'ejirandibûne?

An jî, dikare, ew ji ber wê ye, ku ç'avkanîyek a dinê ya cudayî yên heyî (altêrnatîv) li ber destê wan nînbûye? An awana newêribûne li dijî kontsêpta "*zanista*" fermî ya dîroknûsîya wan welatan derên, lewra ku ewana bi xwe nûnerîya zanista fermî ya welatê xwe kiribûne?

Piştî mitaleyên weha, mamosta Ezîz ê Cewo tê ser wê dîtînê, ku divê mirov lêger'înên

<sup>4</sup> Алберт Олмстед, История персидской империи, Москва, 2012, сс. 36–38.; Дьяконов, Указ. соч., сс. 413–424.; Энциклопедический Словарь Ф. А. Брокгауза и И. А. Ефрона, СПб, 1890–1907, сс. 238–239.; А. А. Опарин, Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997, сс. 54–58.; Ezîzê Cewo, Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere? – Amed, s. 2017.

sersedema hebûna cudaxwendinên jînenîgarîya Zerdeşt P'êxember hema ji vê hêlê va pêk bîne. Ma ne, cêr'ibandinên jîyanê didin xuyan, ku di dîroka mirovahîyê da hîç tiştek jî bêşop wînda nabe, zû, yan dereng hemû tiştên veşartî dertên ber ç'avan!

Û ew lêger'inên xwe yên zanistî li ser vê note didomîne.

Ew armancê datîne pêşîya xwe, ku di k'arê lêger'îna jînenîgarî û pêkanîna erk'a bawerîdarîyê ya Zerdeşt P'êxember da divê dîroka serpêhatîyên hinartî elek-bêjîng bike, delîl û daneyên dîrokî ji hev vebijêre û r'astîya dîrokî derxe r'onahîyê. Û ji bo wê ew van pirsên serke cuda dike, ên ku ew divê bersîvên wan bibîne:

1. *Gelo çiqasî pêkan e, ku Zerdeşt P'êxember dikaribûye r'astî du desthilatdaran (hukumdar) bê, yên ku di serdemên cuda da jîyane (û herdu jî – Vîstaspa!), û, xwedêgiravî, ewana dema pêkanîna erk'a wî ya bawerîdarîyê li wî xwedî derk'etine?*

2. *Ev hemû çiqasî anegorî heşmendîya pêşveçûna pêvajoyên dîrokî, p'ewendîyên civakî û k'ronologîya wê serdemê ye?*

Û, ji bo ku bersîvên van pirsan bibîne, ew careke dinê veger'in ser wê pirsê, ku di wan herdu şaxên "*jînenîgarîya*" Zerdeşt P'êxember da du serdar hebûne, û herdu jî navê xwe *Vîstaspa* bûne. Anegorî wan şaxên "*jînenîgarîyê*", yek ji wan "padişahê" Baktrîyayê bûye – li p'er'ê dewletê yê r'ojihilatê, lê yê dinê – serdarê "herêma wê ya bakûr" ...

Di nava lêger'inêran da t'erefdarên herdu şaxên "*jînenîgarîya*" P'êxember jî hene.

Ji bo ku mirov bi hîpot'êtîkî (bi r'awêjî) bizanibe, k'a ji wan herdu serdaran k'îjanî dikaribû, bibûya piştovanê Zerdeşt P'êxember, mamosta Ezîz ê Cewo di sêrî da r'avedike, ka ji wan hîpot'êzan (r'awêjan) k'îjan anegorî r'astîyên wê serdemê ye?

Û ev dibe gava wî ya yekem a r'eal li ser r'êya diyarkirina cîyê pêkanîna erk'darîya Zerdeşt P'êxember û herêma belavbûna destpêkî ya bîrûbawerîya *zerdeştîyê*, û bi vê r'a, wisa jî – cîhê jidayîkbûna Zerdeşt P'êxember.

Ji bo vê, ew lêger'inên xwe yên zanistî ji wî şaxî destpê dike, li k'u di derbarê *Gûştaspê* (*Vîstaspa*) serdarê Baktrîyayê da tê gotin.

Ew wan danayên dîrokî yên di derbarê Gîstasp (*Vîstaspa* / *Gûştasp*) da tîne, yên ku di dîroknûsiya kevneşopî da hene. Û di derbarê wî da jî, tê zanîn, ku, piştî wê, dema sala 465-an a berî serdema me di encama dek' û dolaba qesrê Xşayarşayê p'adşahê farsan û Dariûsê lawê wî yê nuxurî tîn kuştin, lawê wî yê dinê, Erdeşîr, ê ku di dîrokê da wek Erdeşîrê yekem tê zanîn, tê ser t'ext. ... Wisa jî tê zanîn, ku Erdeşîr di p'evçûna di qesrê da Artabanê serokê p'arastina p'adşê û Aspamîtrayê serekê harema p'adişê dikuje. Lê sala 464-an a berî serdema me *Gûştaspê* (*Vîstaspa*) birayê Erdeşîr – satrapê (walî) Baktrîyê li dijî wî serî hildide, têk diçe û tê kuştin. Piştî vê, ji metirsîya derbeya hindur'în (ya qesrê), bi fermana Erdeşîr birayên wî yên dinê jî dikujin...

Û li vira li bal mamosta pirseke r'ewa r'û dide: "*Ma, di r'ewşêke weha da, dema di qesrê da û li derdorên wê hemû amade bûne, û t'enê ç'av li demê bûne, k'a çawa hev t'une bikin, gelo yekî ji wana dê bikaribûya dilovanîyê û xêran bike û heya piştovanîya mirovekî nenas bike, yê ku erk'a p'eyamdarîya olî pêk tîne, û heya ji bo wê alîk'arîyê jî bide wî, ku ew oleke nenas di nav gel da belav bike? – Ew jî wê demê, dema *Gûştasp* (*Vîstaspa*) bi xwe jî ne ku p'adişah bûye, lê her t'enê satrapek bûye, ew jî di demeke p'ir' kurt da! Li ber ç'avan e, ku heşmendîya pêkhatina bûyerên dorokî û daneyan di derbarê wê nêr'înê da t'u govanoyê nadin, ku, xwedêgiravî, *Gûştaspê* satrapê Baktrîyê piştovanîya Zerdeşt P'ê-xember kiribe!"*

Mamosta li vira wisa jî r'ewş û mercên dinê tîne, yên ku govenîyê didin, ku ev şaxa ne pêkan e: "*Ji bilî vê, wisa jî dane û bûyerên dinê li dijî vê nêr'înê ne: tê zanîn, ku navê hîç serdarekî ji binemala hexamenîyan di "Avêstayê" da nayê bîranîn, yên ku piştî sala 550-î (ya berî s.m.) r'êvebirîya welêt pêkanîne. Ango, Zerdeşt P'êxember berî serdema hexamenîyan jiyaye û erk'a xwe ya p'eyamdarîyê pêk anîye û nikaribûye r'astî wî satrapî bê, yê ku bira û hevdemîyê Erdeşîrê I bûye. Û Erdeşîr jî, wek ku tê zanîn, di navnîşa serdarên hexamenîyan da padişahê şeşem bûye (s. 464 – 425 berî s.m.) ...*"<sup>5</sup>

<sup>5</sup> Дьяконов, указ. соч., сс. 47–54.; Энциклопедический Словарь... сс. 881–884.; Опарин,

Û pîrsa di wê derbarê da, k'a bi r'astî dîroka têk'ilîyên Zerdeşt P'êxember bi Vîştaspa r'a çawa bûne, ew Vîştaspa, yê ku hinek wî wek "serdarê herêmên bakûrî" bîr tînin, lê bi r'astî dost û piştovanê Zerdeşt P'êxember bûye, mamosta Ezîz ê Cewo cuda dinirxîne...

Ew wisa jî dide xuyan, ku hinek lêger'îner di derbarê Kavî Vîştaspa da wek "serdarê herêmên bakûrî" bîr tînin, û, dibêjin, xwedêgiravî, *Zerdeşt P'êxember*, dema bê cîh û st'ar maye û li ser r'êyan bûye, ew anîye ser bîrûbawerîya xwe. Û ew balê dik'işîne ser wê yekê, ku di r'astîya xwe da di beşên cuda yên "*Avestayê*" da *Kavî Vîştaspa* wek piştovanê p'adişahî û dostê *Zerdeşt P'êxember* hatye navkirin, yê ku hatye ser r'êya r'astyê û li dû bawerîya *Spîtamâ* çûye. Û, wek govenîya van dîtinên xwe, ew gotinên ji Gatên Zerdeşt P'êxember tîne:

*"Divê mirov berê pêşin dostê wisa baş nas bike? – Zerdeşt P'êxember pirseke hr'êtorîk dide û bi xwe jî bersîva wê dide. – Helbet, ew piştovanê p'adişahî ye, ew serok (kavî) Vîştasp e.*

Ez bi pesnbêjîyên Ahûra-Mazda û bi R'amana Qenc ji bo wî dibêjim".<sup>6</sup>

Û wisa jî:

*"Wisa Kavî-Vîştaspa*

Bi Desthilata vê yekîtiyê gihîşt,

Li ser r'êya r'astîya Bîrûbawerîyê

Bi Zanînen Qenc derk'ete pêş:

Bila *Mazda Ahûrayê* pîroz

Ya me bi r'ayê xwe bîne sêrî!"

*"Kavî-Vîştaspa p'adişahê yekem bûye, yê ku li Zerdeşt P'êxember xwedî derk'eteye û bîrûbawerîya wî di nav gel da belavkirye"*<sup>7</sup>...

Bala xwe bidinê, *Zerdeşt Kavî Vîştaspa* serok nav dike!

Îro êdî li bal kesekî hîç gumanek jî nemaye, ku *Kavî Vîştaspa* piştovanê *Zerdeşt P'êxember* bûye û bîrûbawerîya wî di nav gel da belav kirye.<sup>8</sup>

Lê, dîsa jî, di ç'avkanîyên cuda û gotarên êntsîklopêdîk da tê gotin, ku ne ew welat, ê ku *Vîştaspa* padişahî lê kirye, ne jî dema jîyana wî nayên zanîn, her çiqas kesek bi guman li hebûna wî ya r'astî nanihêr'e...

Bi r'astî jî, gotineke balkêş e!

Ma, ev ne paradok's e?

Ma tiştekî wisa dikare bibe, ku mirov serdarîya dewleteke gewre kiribe, ku xêr û dîlovanî k'arê wî bin, piştovanîya *P'êxember* kiribe, lê di derbarê wî da tiştekî diyar û pêbawer li hole nîbe?

Ev nak'okîya ji k'u tê? Ma ne agahîyên dîrokî yên bêhtir pêbawer hene, lê zanîyar bi t'u awayî "*nikarin*" şopên wê dewletê bibînin, a ku bi r'astî di dîrokê da hebûye û xwedî p'adişahî û p'êxember bûye?...

Belê, helbet, hîç tiştek jî dê dyar nîbe, eger di dîroka dorîzemanan da her tişt wisa lêpovajî kiribin, ku dîroka dewleteke gewre, ya ku bi r'êalî hebûye û p'adişahê wê jî mêrekî bavçê û comerd bûye, kiribin efsaneya xewner'ojk û xiyalên sedsalên navîn! – Mamosta Ezîz ê Cewo nêr'îna xwe di vê derbarê de t'omar dike û destxweda jî balê dik'işîne ser paradpk's-ek a dinê jî: *di hinek ç'avkanîyan da Vîştaspa wek padişahêkî nebînayî û bêhemp'a, têk'oşer'ê ji bo bawerîya r'astî û dadwerîyê didin nasîn, bi t'aybet lehengîya wî ya serbazîyê didin xuyan, lê di hinek cîhên dinê da ç'avnebiharî û sewdaserîyê bi nave wî va datînin*...<sup>9</sup>

указ. соч., с. 56

<sup>6</sup> Гаты Заратуштры, Пер. с авестийского, вступ. ст., ком. и прил. И. М. Стеблин-Каменского, Санкт-Петербург, 2009, с. 123.

<sup>7</sup> Гаты Заратуштры..., с. 153.; Азиз э Джаво, указ. соч., сс. 71–73.

<sup>8</sup> Ричард Фрай, указ. соч., сс. 62–63.

<sup>9</sup> Мирча Элиаде, История веры и религиозных идей, Т. I, Москва, 2002, сс. 281.; Мифы народов мира: энциклопедия, Гл. ред. С. А. Токарев, Москва, 1980, сс. 198–282.; Азиз э Джаво,

Û, ev nak'okîyên weha di van, qaşo, "agahî", nêr'în û dîtina da ji k'u tên? – Mamosta pîrseke hr'êtorîkî dide û mitale-r'amanên xwe di vî warî da didomîne. Ew şîrove dike, ku, her çiqas, piştî ku Qurûş di *Medyayê* da bi xayîntî desthilatdarî hildabûye destê xwe, û r'êvebirên fars ên nûpêk'etî li ser asta dewletê bi berekêva demnûsîya drokê (k'ronologî) lêpovajî jî kiribûne, hemû dane û nav bi hev guhar'tibûne, mîrîsa dîrokî û çandî ya gelê med (bixwîne: *k'urd*) li ser xwe nivîsbûne, lê, dîsa jî, mirov îro dikare gelek şopên dîroka r'astîn bibîne.

Û bi hev guhêr'indina dane û navan, û lêpovajîkirina agahîyên di derbarê bûyerên dîrokî da hîç demekê jî r'anewestyane. Ewana ji bo r'êbaz û metoda "*zanistî*" ya dîroka fermî û siyaseta dewletê ya wan welatan bûne bîngeh. – Mamosta dinivîse û r'aman û mitaleyên xwe didomîne: – ...*Û cîyê matmayînê ye, ku îro di cîhanê da êdî ne ku t'enê bi berekê va fêrî wan têoriyên zanista lêp dibin, lê her weha, mirov xemgîn dibe, ku wisa jî lêger'înerên welatên şaristanî bi hêsane ew agahoyên lêpovajîkirî di berhemên xwe yên zanistî da wek ç'avkanîyên pêbawer k'ar anîne û îro jî k'ar tînin.*

Helbet, ew wan agahîyan k'ar tînin, ên ku li ber destê wana hene, û ji bilî ç'avkanîyên farsan jî tiştekî dinê li ber destê wana nîne. Û hinek lêger'îner hewl didin, ku sînoren wan "*normên*" *zanistî* derbaz nekin, ên ku ji hêla dewletê va ji bo pêkanîna lêger'înen "*zanistî*" hatine p'ejirandin?... Di encama nêzîkbûneke weha da îro ewqas r'ûpelên ne dyar ên dîrokan gelên vê herêmê di bin sîya dîrokê da veşartî mane.

Lewra jî, ji bo ku dîrok nebe *demnûsîya* (k'ronolojî) *paradok'sên sedsalên navîn*, ji bo ku bûyerên dîrokî êdî wek *efsane-ç'îrokan* neyên xuyan, ji bo ku mirov tê bigihîje, k'a bi r'astî di derbarê çî da tê gotin, divê tayê pêşveçûna heşmendî ya dîrokî bibîne, xwe bi serê wî tayî va bigire û bi wî pêşva her'e, û yek bi yek, derem bi derem, dîmenê giştî yê bûyerên dîrokî yên wê demê ji nûva vejinîne... – Mamosta bi bawer dibêje, û paşê dipirse: – *Lê mirov çî bike, eger daneyên dîrokî heya wê r'adeyê hatine berovajî û lêpkirin, ku p'ir' diwar e, wana vejinînin? Mirov çawa bike, dema di hezarsalan da li dû hev hemû danayên dîrokî wisa lêpovajî kirine û gîhandine wê astê, ku diwar e, heya, hîç nebe, mirov bikaribe bi t'exmînî dîmenê bûyerên demên bihurî vejinîne û bîne ber ç'avan? – Û piştî vê pîrsê, ew lêger'înen xwe yên ji bo dîtina r'ûpelên dîrokê yên "windabêyî" didomîne...*

... Û li ser vê r'êyê, li ser bîngeha wê r'êgezê, ku *cîhan* û *dîroka mirovahîyê t'enê bi Îranê* (*Fars jî di nav da*) bi sînor nabe, – Mamosta didomîne–, *mîrov divê berfirehtir di pêvajoyên dîrokî binihêr'e, û wê demê dê bikaribe gelek dane û agahîyên balk'êş ên di derbarê serdemên cuda yên dîroka vê herêmê da bibîne. Ma ne, ji bilî vê herêmê gel û welatên dinê jî hene – mezin an biçûk, ên ku şopek a berbiç'av di pêşvaçûnên dîroka cîhanê da hiştine?*

*Di peykerên nivîskî yên kevnar ên wan welatan da gelek agahîyên balk'êş jî hatine p'arastin. – Ew didomîne. – Beşekî wan ç'avkanîyan hatine lêger'andin, lê beşê dinê hê benda dema xwe ne... Û, heya mirovê bikaribe gelek agahîyên balk'êş di wan destnivîsan da jî bibîne, yên ku di dema xwe da lêger'îneran bala xwe jî "nedanê" ...*

Li vîra jî ew dîyar dike, ku di vê pîrsê da bi t'aybetî jî destnivîsên ermenîyan balk'êş in. Di wan destnivîsan da gelek agahîyên hêja hatine parastin û hatine-gihîştine dema me, yên ku dikarin ne ku t'enê kêrî lêger'înen dîroka gelê ermenî bixwe, lê, her weha, kêrî lêger'înen dîroka gel û welatên dinê yên herêmê jî bîn, ên wek: *med-k'urdan*, *asorîyan*, *farsan* (*hexamanîyan*, *sasanîyan*, *p'ert'ewîyan*) û yên dinê. Ku evan ç'avkanîyana dikaribûn gelek r'ûp'elên tarî yên dîrokê r'onî bikirana. Ku di nava wan destnivîsan da jî ya here balkêş ji bo lêger'înen zanistî *serekç'avkanîya* dîroka ermenîyan – berhema *Movsês Xorênat'sî* ya "*Dîroka Ermenîstanê*" ye (dewra V a s.m.).

Helbet, di p'irtûka navborî ya mamosta Ezîz ê Cewo da danasîn-nirxandinke berfireh di derbarê ç'avkanîyên ermenîyan da heye, ew wan ji p'ir' alîyan va bi zanistî dinirxîne, analîza zimanzanî-êtîmologî ya nav û têrminan pêk tîne, lêbelê, ew lap mijarek a dinê ye. Ezê li vîra her tenê hinek p'arç'eyan bînim, ên ku têk'lîya xwe bi vê pîrsê r'a hene... Dîyardeyek

a balkêş: her çiqas, Xorênat'sî bi daxwez û spartina Sahak Bagratûnîyê serekfermandar, r'êvebir û *mêkênasê* ermenî yê dewra V a s.m. (*mêkênas* – mirov, ê ku piştgirîya weşana wêjeya hunerî, ya *dîrokî* û *huner* û *çandê* dike, li wan xwedî derdik'eve û projeyên wan fînanse dike) neç'ar maye, wisa jî mît-ç'îroka farsan a di derbarê p'adişahê Medyayê Îştûvêgû / Astîagê p'ir'hespî (erm. Բյուրասպի Աժդահակ / Byuraspi Aždahak) di p'irtûka xwe ya “Dîroka Ermenîstanê” da cîh bike, ya ku, eger meriv bi zimanê dema me bibêje, mî-nakek a bawerdar e di derbarê k'aranîna tek'nolojîyên siyasî yên gemar di cîhana kevnar da, lêbelê, di heman demê da ew fersendê ji destê xwe bernade, ku helwesta xwe ya neyînî di derbarê wê da binivîse: ew wê “*bêwat'e û bêkêr*” nav dike.<sup>10</sup>

Û mamosta gotinên Movsê Xorênat'sî yên ji bo Sahak Bagratûnî tîne: “...Çi pêdivîya te bi van ç'îrokên *bêwat'e* heye, an jî tuyê çî ji van gotinên *bêwat'e û bêkêr bikî?* <...> Lewra, ji bilî wê, ew (*fars* – E.C.) bi xwe jî wan hemûyan *tênagihîjin* ...”<sup>11</sup> – Û ji bilî vê:

“Ev çî xwestek e, gelo, ku tu li hember wan mîten *bêkêr û bêcûr'e* yên di derbarê *Ajdahakê Byûraspî* da didî pêş? An jî, tu ji bo *xatirê çî* me bi van ç'îr'okên farsan ên *bêwat'e û bêtem* va didî mijûlkirin, an çêtir e, mirov bibêje – bi wan ç'îr'okên di derbarê qencîyên wî yên ne qenc da, di derbarê wê da, ku dêwan xizmeta wî kirine, ku ewî nikaribûye r'astîyê û derewan ji hev cuda bike, ku dêwan sergirkên milên wî maç'kirine, û ji wan zîya derk'etine...

...Îro ez p'eyv û gotinên wan bi destê xwe dinivîsim, ên ku em ji wan nefret dikin, heya mirov ji demgê wan jî zivêr dibe: – ez wat'eyê didim gotinên wan ên *bêwat'e û bûyerên* wan ên p'ir' kevn, ên ku ew bi xwe jî *tê nagihîjin*, weha, ez şirove dikim, her t'enê bila dilê te şad bikim, an k'arekê bigihînim te. Lê tu divê nefreta me ya li hember wan gotegotan bizanibî, lewra jî me di p'irtûka xwe yekem da cîh neda wan, ne jî di beşê dawîyê da, lê em ewê di cîhekî dinê yê cuda da datînin. Û ezê weha destpêbikim.

...Min ew di p'irtûka keldanîyan da dîtye... Ewî (Astîyag//Ajdahak//Աժդահակ. – E. C.) gotye, ku divê hemû *fêrî jîyana* bi *şewazekî* hevbeş bibin, ku divê hebûna kesekî ya cuda nînbe, lê divê her tişt ji bo hemûyan *giştî-t'omerî* be.

Her gotineke wî, her k'arekî wî vekirî, li ber ç'avan bûye. R'amanên wî yên bi dizî û *veşartî nînbûne*, û her tiştê ku di dilê wî da hebûye, ewî li ber hemûyan vekirî anye zimên: û ewî bir'yar dabûye, ku mafê dostan heye, şev û r'oj bik'evin bal wî û derên. Û ev jî, wek ku *tê gotin*, qencîya wî ya neqenc bûye”.<sup>12</sup>

Balk'êş e, ne?!

Ma, Îştûvêgû di t'evahîya doroka mirovahoyê da çî ne serk'êşê r'amana *wekhevîya sosyalî* bûye?! – Mamosta pîrsa hr'etorîk dide û bi xwe jî şirove dike: –Wek ku *tê xuyan*, hema ev jî bûye sedema wê, ku mirovên nêzîk xiyamet li wî kirine, bûne hevk'ar û hevp'arên derbek'aran û bi wê yekê di dîroka Împêratorîya Medyayê da *xala dawîyê danîne*.

Û diyardeyeke dinê ya balk'êş jî, wek ku mamosta Ezîz ê Cewo dinivîse, heya sedsala XVI ji bo ermenîyan, k'urd û med yek net'ew bûne (dema ermenîyan gotine “*k'urd*”, med têngihîştine, û, berovajî wê, dema gotine “*med*”, k'urd têngihîştine).<sup>13</sup> Ewana wisa jî ên k'urd û med wek peyhatîyên *Vîştaspa* zanibûne, yên ji binemala wî (bi ermenî: *vîştaspazûn*). Lêbelê, her çiqas, farsan bi *dek'bazîyan* û bi *nemamî*, bi r'êya *derbeyê* di Medyayê da *desthilatdarî* hildane destê xwe jî, li ser bingeha wê dewleta xwe ava kirine, bi wê yekê bûne mîrat'xur û dûmdarên Împêratorîya Medyayê jî, lêbelê ermenîyên cînar t'u carê fars wek med nas nekirine, her çiqas vasaletên wan jî bûne, lê, berovajî vê, ji bo ermenîyan bi dîrokî

<sup>10</sup> *Մովսես Խորենացի*. Հայոց պատմություն. – Երևան, 1991; *Мовсес Хоренаци, История Армении*. Ереван, 1990, сс. 89–92.; *Азиз э Джаво*, Указ. соч., сс. 72–78.

<sup>11</sup> *Хоренаци*, указ. соч., сс. 89–92.

<sup>12</sup> *Азиз э Джаво*, указ. соч., сс. 72–78.

<sup>13</sup> А. Мамоян, “Где же историческая правда?”, [https://kurdistan.ru/2013/06/10/articles-19054\\_Gde\\_zhe\\_istoricheskaya\\_pravda.html](https://kurdistan.ru/2013/06/10/articles-19054_Gde_zhe_istoricheskaya_pravda.html).; А. Мамоян, “Армянский богослов начала XX века об эздиян изздianстве”, <http://kurdistan.today/armyanskij-bogoslov-nachala-xx-veka-ob-ezdian-i-ezdianstve/>.

hert'im jî med û k'urd yek net'ew bûye.

Ew dinivîse, ku di vê derbarê da di ç'avkanîyên ermenîyan ên sed sala navîn da jî dane û govenîyên pêbawer hatine parastin û çendekan ji wan tîne:

“...Berbangê zû ên med hatin, ên ku ji wan r'a k'urd tê gotin”. – Ev bûyer, a ku li vira di derbarê wê da tê gotin (ango hatina med-k'urdan a ber dêra ermenîyan a *T'spnê*), 19-ê gulana 1426-an pêk hatye.<sup>14</sup>

“... Binecîyên wî welatî, ên ku k'urd in, ji wan r'a med dibêjin” – Ji destnivîsa sed sala XVI.<sup>15</sup>

Agahîyên balk'êş wisa jî li bal Xaçatûr Abovyan hene. Weha, ew di têbînîyên gotara “Ên k'urd” da çi dinivîse: “*Çamçyan di p'irtûka xwe ya “Dîroka Ermenîstanê” da (berg a I, beşê 10, rû. 100), dema anegorî dîroknûsên yewnanî, yên wek Hêrodotos, Dîodoros, Alikar û yên dinê bi r'êzê navên nûnerên p'adişahê Medîyayê (wali), ji Arbûkês heya Dîokês, tîne û dibêje, ku ên med (ango, k'urdên kevna) di her herêmekê da li dora mîrên xwe ji hev cuda jîyane...*”<sup>16</sup>

Mamosta Ezîz ê Cewo wisa jî dinivîse, ku di berhemên nivîsk'ar û dîroknûsên ermenî yên dema bêhtir nêzîkî me – yên sed sala XX da jî agahîyên vî r'engî r'astî mirov tîne, û hinek p'arçeyan ji p'irtûka “Kurmanjên yêzîdî” («Եզդիներ Կուրմանջ») ya ezdazanê ermenî yê destpêka sed sala XX S. V. Têr-Manvêlyan tîne:

“... peyhatîyên medan – kurmancên êzdî”

“Nevîyên Îşûvêgûyê (Astîagês) p'ir'hespî, êzdîyên îroyîn...”

“...peyhatîyên dawîyê yên Êk'batanê – dewleta gewre ya demekê (Êkbatan. – p'aytexta P'adşahtîya Medya kevna bûye. – E. C.), kurmancên êzdî...”

“Cînarên me yên xêrxwaz ên îroyîn – kurmancên êzdî ... şaxekî hêztirîn cînarên me yên demekê – medan û peyhatîyên Îşûvêgûyê (Astîagês) ji binemala Vîştaspa ne”.<sup>17</sup>

Lêbelê, di jîyana gelan da di pêvajoya pêşveçûnên dîrokî da ne her tişt e, ku wisa r'ast û yekawa derbaz bûye. – Mamosta didomîne. – Di serdemên dîrokî yên cuda da di nava p'ewendîyên wan da guhar'tinên cuda pêk tîne, ên ku bandora xwe li ser warên cuda yên jîyana wan dihêlin, û lewra jî, ji ber wan guhar'tinan, di têgînan û têgîhîştinên mirovan da gelek tişt tîne guhar'tin, gelek tişt tîne lêpovajîkirin...

Wek ku tê zanîn, di dîrokê da hîç tiştek jî bê şop wînda nabe! Û hê ji kesekî r'a li hev nehatye, evê r'astîyê betal bike. – Mamosta dide zanîn û nirxandina xwe ya zanistî didomîne ... – Dem tê, û ew, a ku demekê windahîyek a bê hêvî hejmartine, bi saya lêger'inên zanistî yên zanîyan, dibe destanîna mirovahîyê. Dîrok gelek bûyerên weha dizane.

Di her serdemekê da li ber civaka zanistî pîrsên heman r'engî r'û didin. Gelek caran bersîvan ji bo wan dibînin, û her tiştek cîhê xwe dibîne.

Lê wisa jî dibe, ku demên nû tîne, merc û r'ewşên nû û mirovên nû dertên holê, yên ku li ser bingeha agahîyên kevn ên dogmatîk, yên guhar'tî û lêpovajîkirî yên wek kevirê hişk li ser r'êya vekirina r'astîya dîrokî dibin asteng.

Wek ku em di serdema pêşveçûna zanistî (progrês) da dijîn, lê heya îro jî, “dîrokzan” li ser bingeha “ç'ir'okên farsan ên bêçûr'e, bêkêr û bêwat'e” (wek ku hê sed sala V a s.m. Movsês Xorênat'sî ew makkirine!) di derbarê net'ewekê da dîtineka lêpêvajî didin sazîrîn...

Wek ku êdî hatibû gotin, di ç'avkanîyên kevna da kesayetîya Vîştaspa wek p'adişahê kî bêmep'a, tîk'oşer'ê ji bo bawerîya r'astî, dadwerp'erwer tê makkirin, bi t'aybet jî, di derbarê gernasîya wî ya serbazîyê da tê gotin (hema agahîyên mîna wan, ên ku Movsês Xorênat'sî di derbarê Îştûvêgû / Astîagêsê lawê Vîştaspa da di “... p'irtûka keldanîyan da xwendibûye”) ... Lê dîsa jî, di ç'avkanîyên cuda da di derbarê wî da “makkirinên” dîrî heş û

<sup>14</sup> Արիստակես Տեղլանց. Հայերգ, – Թիֆլիս, 1882, էջ 175 – 180;

<sup>15</sup> Հայաստանի Մատենադարան. XVI դարի ձեռագիր № 1495, էջ.էջ. 142ա և 142բ;

<sup>16</sup> Աբովյան Խ. Երկերի լիակատար ժողովածու, ութ հատորով, ութերորդ հատոր. – Երևան, 1958, էջ 284;

<sup>17</sup> Տեր-Մանուկեան Ս. Վ. Եզդիի կուրմանժ, Ախալցխա, 1910 թ., էջ 3–6 և 41.

sewdayan r'astî mirov tên.

Çima?

Di p'irtûka Ezîz ê Cewo Mamoyan da di wê derbarê da hatye vegotin, k'a Qurûşê fars ê satrap, t'or'in ê *Îştîvêgûyê* p'adişahê dawîn ê *Mediyayê çawa* tê ser t'ext (ê ku paşê wek Qurûşê II tê zanîn) ... Wek ku tê xuyan, ku berî ji ser t'ext avîtina kalikê xwe, *Qurûş* hem di nava giregiran da, hem jî di nava gelê sade da li dijî p'adişê kampanîyeke çalak a r'eşkirinê meşandye, ji bo ku di nava wan da t'avîyên (mewzî) wî lewaz bike, wana li dijî wî helwestdar bike. Ew bi r'êya mirovên xwe di nava gel da *gotegotên vala û bêkêr ên di derbarê tiştên bûyî-nebûyî* da di derbarê kalikê xwe da dide belavkirin. Û, wek ku tê xuyan, ew ç'îr'okana wek r'astîyekê hatine p'ejirandin, ji ber ku ew ji hêla nevîyê p'adişê bi xwe va hatibûne belavkirin, ji hêla wî mirovî va, yê ku, hem di qesrê da, hem jî di malbata p'adişê da, wek ku di nava gel da tê gotin, "*mirovê malê*" bûye...

Wek ku tê xuyan, hema evê jî di k'arêm ji ser t'ext avîtina *Îştîvêgû / Astîagês* da r'ola bir'yardar lîstye.

Piştî ji ser t'ext avîtina p'adişê jî ev şer' û şilt'ax û buxdanbêjî didomin û di nava gelê cînar da jî belav dibin, bi t'aybet jî di nava ên vasal (bindest) da. – Mamosta didomîne. – Lewra ku, wek ku tê zanin, *afrandinên gelêrî yên zarkî carna welatê xwe nizanin*.

Û dîroknûsîya fermî ya farsan jî destpêkirye gavên xwe yên yekem hema li ser bingeha ç'îrokên wî r'engî biavêje.

Wek ku tê xuyan, hê dereng ç'îr'okên vî r'engî k'etine bingeha hinek şaxên berhemên dîroknûsên kevnar jî, di nava wan da, wisa jî ya "*Dîrok*"-a Hêrodotos.<sup>18</sup>

Û mamosta Ezîz ê Cewo Mamoyan dibîne, ku hema, kilîta r'avekirina mîta farsan a di derbarê *Îştîvêgûyê P'îr'hespî*<sup>19</sup> yê p'adişahê dawîyê yê *Mediyayê* da, û k'ilîta r'onîkirina ser-pêhatîyên di derbarê têk'ilîyên *Kavî Viştaspayê* nebînayî û *Zerdeşt P'êxember* da hema di vira da ye.

*Hema ç'îr'okbêj- "dîroknûsên"* qesrî yên farsan bi vî awayî di hindûrê qesrê da li dû hev danayên dîrokî bi hev diguhêr'in, bûyeran lêpovajî dikin, navên kesayetîyên dîrokî wisa diguhêr'in û her tiştî wisa berovajî dikin, qey bibêjî, kesayetîyên wisa hîç di dorokê da nînbûne jî... – Ew didomîne. – Lewra jî, tiştê matmayînê nine, ku di hewayeke wisa da divê şêwazdayîneke wisa ya dûrî heş û sewdayê mirov a "*dîroka windabûyî*" ya *Kavî Viştaspayê* p'adişahê nebînayî û welatê wî derk'eta holê: "...ne di derbarê wî welatî da, yê ku ewî p'adşahtî lê kirye, ne jî di derbarê dema jîyana wî ya r'êal da hîç daneyeke r'astîn nîne, her çiqas, hîç şik û gumanek nîne, ku p'adişahekî wisa bi r'êalî hebûye". – Di makkirina dîrokzanan da tê gotin. – Ango bi r'a û daxweza komplok'aran û xulamok-xayînan ew p'arçeyê bi r'ûmet û bêhemp'a yê dîroka Mediyayê ji k'ronologîya dîrokî (dîroknûsî) hatye windakirin.

Û, hema ji vê jî, mirov dikare bi dibeyeke (îhtîmal) mezin bibêje, ku sedema wê, ku dîroknas bi t'u awayî "*nikarin*" ne welat, û ne jî dema p'adişahtîya *Kavî Viştaspa*, û ya p'êxembertîya *Zerdeşt* bi awayekî bibînin, hema di vira da ye...

Lêbelê eva her t'enê t'erefekî pîrsê ye! Û mamosta hema ji vî t'erefê dîtina pîrsê va jî lêger'inên xwe didomîne: "Ji ber ku jîyana *Kavî Viştaspa* û ya *Zerdeşt P'êxember* p'abendî hev in, û "*hîç şik û gumanek jî nîne, ku p'adişahekî wisa (Viştaspa) bi r'êalî hebûye*, – ew didomîne, –em binihêr'in, k'a di zanista dîrokî ya kevnêşopî da di derbarê wî p'adişahê nebînayî û bêhemp'a da çi dyar e, bi t'aybet jî, bi giştî, di derbarê dem û welatê p'adişahtîya wî da".

Li vira mamosta Ezîz ê Cewo gotinên zanyarê navdar ê amêrîkî R'îçard Fray yên di derbarê wê serdemê da tîne: "*Li ber destê me dane nînin, ên ku bikaribûna dema r'astîn a jîyana Zerdeşt dîyar bikirana; mirov her dikare bibêje, wek ku tê xuyanê, ew di serdema berî damezirandina dewleta hexamenîyan da jîyaye...*"<sup>20</sup>

<sup>18</sup> Геродот, История, Кн. I., Гл. 107, 125 и 130.

<sup>19</sup> *Umfuku Iwankliugh. Çuyng uquunînjayî. – Epluul, 1991 p., t.2 89–92;*

<sup>20</sup> *Ричард Фрай*, указ. соч., сс. 49 – 50.

Û ji vira jî mamosta Ezîz ê Cewo nêr'îneke heşmendî dertîne holê: *eger P'êxember berî damezirandina Împêratorîya hexamenîyan jîyaye û erk'a xwe ya p'êxembertîyê pêk anye, wisan e, ew wê demê bûye, dema hê Împêratorîya Medyayê hebûye...* Û li vira heya hîç pêwîst jî nake, ku mirov zêde lê biger'e, jixwe der-dorê sed û bîst salî berê jî di cîhana zanistê da dizanibûne, ku bîrûbawerîya *Zerdeşt* ola binecîyên Îrana kevnar bûye, di sêrî da ya *medan û baktrîyan (Bactrians)*, paşê ya *farsên* dema hexamanîyan û sasanîyan.<sup>21</sup>

Ew dinivîse, ku R'îçard Fray, ji bo dîyarkirina t'emenê *Zerdeşt P'êxember* û dema ku ewî p'adişah *Vîştaspa* anye ser bawerîya zerdeştîyê, hejmartinên balk'êş pêk anîne û li ser wê bingehe ev encamana derxistine hole: "... *Divê mirov ji bîr neke, – R'îçard Fray dinivîse, – ku sala 588-ê berî serdema me, ya ku dikaribû anegorî wê demê bûya, gava Vîştaspa bîrûbawerîya Zerdeşt p'ejirandye (wek ku gihîştîye me, ew wê demê 42 salî bûye)...* *Anegorî heman kevnêşopîyê, – ew didomîne, – Pêxember di 77 salîya xwe da mirye, wisa, eger mirov ji xwe r'a armanc bike û li ser bingeha pêşbînîyên nêzikî heş û sewdayan û kevnêşopîyên zerdeştîya hê dereng li danayên dîrokî yên di derbarê Zerdeşt da biger'e, wê demê ew salên 628 – 551ê yên berî s.m. ne...*"<sup>22</sup>

Û peyr'a jî mamosta dibêje, ku R'îçard Fray li ser bingeha lêger'inên agahîyên dîrokî, yên di derbarê *r'ehên medîyayî* yên çanda *hexamenî* (û ne t'enê ya wê), ver'esandina pîrsa navborî nêzîktir dike: "...*di nivîsên kevnar ên farsî yên li ser zinaran da – R'îçard Fray dinivîse, – têrmînên ji hêla wat'eya xwe va girîng hene, yên ku, wek ku tê xuyan, şêwazên wana yên medî ne, ne ku farsî, û ev jî dide xuyan, ku Hexamenîyan ew ji bakûr wergirtine (ango, ji Medyayê. – E. C.). – Û ji wê pêva, ji bo ku nêr'îna xwe piştrast bike, ew gotinên Strabon tine: "Yên med, lêbelê, wek ku tê gotin, bavpêên kevnêşopîyên ermenîyan û berî wana yên farsan bûne, qiral û peyhatîyên desthilatdarîya wan a di Asîyayê da ne. Mînak, peyva "sto'la", ya ku xwedêgiravî ya farsan e, hezkirina wan a berbi k'aranîna tîr û kevanan û cirîdê, xizmeta p'adişahan, cil û wergirtina wan û r'êzgirtina asta xwedayî li hember p'adişahan ji hêla gelê sade va ji medan derbazî nava farsan bûye".*"<sup>23</sup>

Ango, her çiqas, gelek daneyên dîrokî, bi "*saya*" hewlên ç'îrokbêjên fars ên qesrê, hatine lêpovajîkirin an windakirin, – *mamosta didomîne*, – dîsa jî, bi alîk'arîya analîza êtîmologî û lêger'inên dîrokî-hemberhevîkirinî mirov dikare, têrmîn û navên "*windabûyî*" jinûva vejînin, û, bi wana r'a, wisa jî, pêvejoya dîrokî ya xwezayî zêndî bike û derxe zanebûnê.

Di vê derbarê da dîtineke bi fesal (endaze) li bal Î. M. Dyakonov heye. – Mamosta didomîne. – Her çiqas ew bi bawerîyeke t'am nabêje jî, ku *zerdeştî* di *Medyayê* da pêşketye, heya, eger ew hinek pêşdîtina tîne zimên jî, ew p'ir' bi mercî ne, lê dîsa jî ev gotinên wî balk'êş in: "... *Di nava r'êza ç'avkanîyên di derbarê dîroka Medyayê da "Avêsta" – p'irtûka pîroz a ola dogmatîk, cîyekî xwe yê t'aybet heye... T'u guman nîne, ku zerdeştîyê p'ir'anîya wan bawerîyan û dirozgeyên ayînî jinûva ji ber xwe dernexistine, ewê ew ji nava bawerîyên gelêrî yên berî xwe hildane, yên ku wê demê kê-m-zêde êdî amade bûne. Lewra jî ji bo dîroka berekên (eşîr) Medyayê yên îranîaxêv û heya ra'deyekê, ji bo berekên dinê jî "Avêsta" ç'avkanîyeke girîng e*".<sup>24</sup> – Û li cîyekî dinê jî, her çiqas, qey bibêjî, di dîtînan wî da r'astêdêr nayê gotin, ku ew hemû yên *Medyayê* ne, lê r'edkirineke wisa jî nîne... Bi nêr'îna wî, eger ew mercên ku di derbarê wan da di beşên kevnartirîn ên "*Avêstayê*" da tînan vegotin, heya, eger ne medî bin jî, lê dîsa gelekî nêzîkî wana ne..."<sup>25</sup>

Û piştî ku dane û agahîyên dîrokî yên cuda bi zanistî analîz dike, mamosta Ezîz ê Cewo digihîje van encaman:

– *zerdeştî* berî pêkhatina dekûdolabên (komplot) qesrî yên Qurûşê satrap û p'eydabûna desthilatdarîya hexamenoyan di *Medyayê* da sêwirîye;

– *zerdeştî* ji sala 588-an a berî serdema me va, dema *Kavî Vîştaspa* ew bawerî p'ejî-

<sup>21</sup> Энциклопедический Словарь..., сс. 881–884.

<sup>22</sup> Ричард Фрай, указ. соч., сс. 52–53.

<sup>23</sup> Ричард Фрай, соч. с. 135.; Страбон, География, Кн. XI., Гл. XIII., П. 9.

<sup>24</sup> Дьяконов, указ. соч. сс. 45–55.

<sup>25</sup> Там же, с. 416.

randye, di *Medyayê* da pêşk'etye û belav bûye;

– piştovanê p'adişahî yê *Zerdeşt P'êxwember*, serok *Kavî Viştaspa* li wî û ola wî xwedî derk'etye, û di wê derbarê da jî di *Gatên Zerdeşt* da agahî hene;

– piştî p'eydabûna r'astîyên dîrokî yên nû êdî mirov dikare, li ser bingeheke zanistî bi r'êya analîzên p'ir'alî û daneyên dîrokî wan pirsan r'onî bike, yên ku berê her bi hizirî (t'ex-mînî) li ser wan axivîne...

Û lêger'înên zanistî yên mamosta Ezîz ê Cewo jî, wî gav bi gav nêzikî r'avekirina sur'ên jîyana p'adişahê nebînayî û bêhemp'a, piştovanê *Zerdeşt P'êxember – Kavî Viştaspa* dikin.

Û vê gave li pêşîya me, li ser r'êya lêger'înên me pirsek sekinye, – ew didomîne: – Çima di demnûsî (k'ronolgî) û dîroknûsîya kevneşopî da navê *Kavî Viştaspa* bi bîr nayîn? Ma ne, di *Gatên Zerdeşt P'êxember* bi xwe da pesnê wî tê dayîn, di ç'avkanîyên ermenîyan ên kevnar û yên hê dereng da medan, padişahê *Medyayê yê dawîyê – Îştûvêgû* û k'urdan bi navê wî didin nasîn û wek nivşên wî nav dikin?!

Çima?

Dema êdî dabeşkirina demî ya serdema mijara lêger'înên me heye, – mamosta didomîne, – mirov dikare bi r'êya hemberhevkirina zanîyarîyên dîrokî û analîzên zanistî pêşva her'e û dyar bike, k'a bi r'astî mabesta wana k'îjan p'adişah bûye?

Naha êdî dîyar e, ku *Zerdeşt P'êxember* t'evahîya jîyana xwe heya sala 550-î (a berî s.m.) di *Medyayê* da derbaz kirye û erk'a xwe ya p'eyamdarîya bawerîya r'ast pêk anye... Bi hejmartinên R'îçard Fray, *P'êxember* di sala 588-an (a berî s.m.) *Kavî Viştaspa* anye ser bawerîya xwe. Lê anegorî demnûsîya dîrokî ya kevneşopî, di wê demê da *Ûvaxşatra / Kîaksar* p'adşahtîya *Medyayê* kirye (salên 625 – 585-an ên berî s.m.).

Çawa dibe? Çi dertê hole?

Ji hêlekê va, anegorî hejmartinên R'îçard Fray, dema *Kavî Viştaspa* zerdeştî p'ejirandye, sala 588an (a berî s.m.) bûye, lê encamên analîzên hemberhevkirinî yên agahîyên dîrokî didin xuyan, ku *Zerdeşt P'êxember* di *Medyayê* da jîyaye û erk'a xwe ya p'êxemberîyê pêk anye. Wisa jî dyar e, ku *Kavî Viştaspa* piştovanê *P'êxember* bûye, li wî xwedî derk'etye û di *Gatên* xwe da *Zerdeşt* wî wek “piştovanê p'adişahî û serok” nav dike. Di destnivîsên kevnar ên ermenîyan da hem med, hem jî k'urdên peyhatîyên wan wek nivşên *Viştaspa* tên navkirin. Ango, her tişt di derbarê wê da dibêje, ku piştovanê p'adişahî yê *Zerdeşt P'êxember* û serokê *Medyayê Kavî Viştaspa* bûye... Û ev hemû jî heşmendî ye!

Lê mirov çî bi van herdû navan bike: *Viştaspa* û *Ûvaxşatra / Xvaşatra / Kîaksar*?

Li ber ç'avan e, ku ev hemû dane, jî bilî navan, li hev digirin!

Wê demê ev cudahî ji k'u tê?

Ma, gelo, dikare wisa bibe, ku du mirovên cuda di heman demê da p'adşahtîya heman welatî kiribin?!

Ev êdî mîstît'sîzm e – tişteki dûrî heş û sewdayê mirov!

Wê demê mirov dikare ç'areya vê t'evlihevîyê li k'u bigere? – Ew dipirse û didomîne. – Me li jorê bi bingeîn bersîvên wan pirsan nîrxandin, ên ku dikarin derên holê. Ji bo wê me bi bingeîn bala xwe ne ku da ser mît û ç'îrokên kevnar û yên sedsalên navîn, lê em berbîr'î pêşdîtinên heşmendî bûn, ên ku ji hêla hinek lêger'îneran va hatibûn gotin. Me wisa jî ew dîtinên hîpot'êtîk li ser bingeha r'astîyên dîrokî nîrxandin û nêr'îna xwe anî zimên... Lê paşê em r'astî vê girêhişkê hatin (kazûs), a ku li ser r'êya lêger'înên me bû kelem...

Lê, her çî jî hebe, lêger'înên me r'anewestyan, ew bê navber domyan.

Lê, eger r'astîyên dîrokî bi hewlên lêpok'arên qesrê yên farsan wisa hatine guhar'tin û t'evlihevkin, ku mirov nikaribe serederîyê lê bike? Wê demê mirov dikare çî b ike? Ma ne, îro, piştî ku me bala cîhana zaniistê vege'and ser wê mîta farsan, a ku di dema xwe da (dewra V a s.m.) *Movsê Xorênat* 'sî di p'irtûka xwe ya “*Dîroka Ermenîstanê*” da cîh kiribû, êdî derfet çêbûne, ku mirov bi mînaka komkrêt a lêpovajîkirina dîrokê li ber ç'avê xwe bibîne û wê nas bike. Û ji me r'a jî derfet'ek p'eyda bûye, ku em bêhtir bi r'êalî li bûyerên dîrokî binihêr'in û wana bi zanistî binirxonim...

Û ji bilî van, ma ne, wisa jî ç'avkanîyên dinê hene, û mirovê bikaribe lêger'inên xwe di wan da jî bidomîne?

Lê, ger pirsgirêk di wê da ye, k'a ew nivîsarana çiqasî r'ast hatine r'avekirin (deşîfrekirin) ...?

Û ev pîrsa jî bê bingeş nîne! – Mamosta Ezîz ê Cewo dibêje û didomîne. – Eger mirov li r'êza van hemû tîrmînan binihêr'e, yên ku ji hêla me va tîr zanîn, dertê holê, ku li vir ne her tişt di cîhê xwe da pêk hatine. Binihêr'in, heman *Vîştaspa* di nivîsarên cuda da bi navne cuda tê bîranîn: *Goştasp*, *Gûştasp*, di ç'avkanîyên yewnanîyan da – *Gîstasp*. Ji bilî vana wisa jî şêwazên p'eyvan ên dinê hene, yên ku bi heman morfêma (p'arîne) saz bûne: *Byûraspî* (li bal *Xorênatsî*), *R'ûhrasp* (li bal *Fîrdûsî*) û *P'ûr'ûşaspa* (navê bavê *Zerdeşt P'êxember*). Dema mirov van şêwazan hemberî hev dike, dibîne, ku di dawîya wan t'evan da p'arîna –*asp* heye. Ango, ew hemû p'eyvên tîk'el ên cuda ne, yên ku bi heman p'arîna –*asp*, anga, '*hesp*', hatine sêwirandin (sazkirin).

Pe'yva *Byûraspî*, ya ku di ç'avkanîyên ermenî da r'astî me tê, tê wat'eya *ya/yê xwedîyê hezar hespî* (*բյւր / byûr*, erm. – hezar / deh hezar+*asp*, îranî – *hesp*). Eger mirov vê p'eyvê hemberî ya *P'ûr'ûşaspa* – navê bavê *Zerdeşt P'êxember* bike (p'eyva *բյւր / byur* – bilêvkirina p'eyva k'urdî-îranî ya *p'ur' / p'ir'* e bi zimzînê ermenî, anga, *gelek*), dê dîmenekî balk'êş derê hole: şêwazê p'eyva ermenî ya *բյւրսպի / byuraspi* û navê bavê *P'êxember* – *P'ûr'ûşaspa* bi şêwazî mîna hev in! Û ev jî, di derbarê medbûna *Zerdeşt P'êxember* de delîleke dinê ye (bila ne bi r'astêdêr be jî!).

– Şiroveyeke balk'êş jî di derbarê p'arîna *vîşt* da li bal akadêmîsyana Î. M. Stêblîn-Kamênskî heye: "...Navê p'adişahê piştovanê *Zerdeşt Vîştaspa bûye (avêst. Vîştaspa <\*vi-šita- aspa-), a ku dikare bê wateya 'yê hespberdayî' ('yê ku hespê wî berdayî ne', an berî ç'êre dane, an ji hev belav bûne) ...*"<sup>26</sup> – Û, ji hêla analîza êtîmolojî ya morfêma (p'arîn) konkrêt va, ev balk'êş e, lêbelê, k'a gelo, emê çiqasî bikaribin wê di nav goveka giştî da, di wê pîrsa kontsêptûal da k'ar bînin, a ku li pêşîya me sekinye, mirov diwar bikaribe îro yek-awa bibêje. – Mamosta bi vê boneyê dibêje û nîrxandinên xwe yê zanistî didomîne. – Li vira dikarin dî pêşdîtin hebin: an ev p'arînana şêwazên cudaxwendinî yê heman peyvê ne, an jî p'eyvên cuda ne. Her çî jî hebe, tiştêk li ber çavan e: di nava van hemû peyvên tîkel da peya – *asp* heye. Û ew jî dibe bingeş, ku mirov bibêje:

– an şêwazê ermenî yê *byûraspî* hatye wat'eya *hezar syarîyan*, anga, [ew, ê ku] hezar (deh hezar) syarîyên wî hene, an jî şiroveya vê p'eyvê jî wek a p'eyva ermenî ya *Ajdahak mînakek* a êtîmolojîya gelêrî ye;

– an hebûna van p'eyvan ji çanda hespxwedîkirinê ya *medan* tê, û di cîhanê da med bi wê bi nav û deng bûne.

Weha, di derbarê hespxwedîkirina *medan* da Î. M. Dyakonov çî dinivîse: "...*Di cîhana kevînar da bi t'aybet ew hesp navdar bûn, ên ku di deşta Nîsayê ya Medyayê da dihatin xwedîkirin, û asorîyan li ber xeracan va ji medan her t'enê hesp werdigirtin...*"<sup>27</sup>. – Bi heman şêwazî mirov dikare p'eyva '*P'ûr'ûşaspa*' – navê bavê *Zerdeşt P'êxember* şirove bike. Ew p'eyv dikare an bê wat'eya *mîrovê pîrhesp*, yê *xwedîyê gelek hespan*, lewra ku ew ne p'adişah an serekfermandar bûye, an jî *mîrov, ê ku gelek sîyarîyên wî hebûne*, lewra ku di heman demê da r'ahîb wisa jî mîr (t'orin) bûne...

Lê, ji hêla dinê va, di ç'avkanîyên ermenîyan da *med*, Îştûvêgûê p'adişahê dawîyê yê *Medyayê* (Astîyagês) û paşê, hê dereng, wisa jî *k'urd*, wek *vîştasapazûn* tîr navkirin, anga, *peyhatîyên Vîştaspa*, ji t'ûr'a *Vîştaspa*. Ev jî delîlek a dinê ye di wê derbarê da, ku *Vîştaspa* padişahê *Medyayê* yê r'eal bûye.

Û di vê da t'û guman nîne, lewra ku ermenîyan di derbarê k'urdan da ji dîrva, ji hinekên dinê nebihîstibûne, ewana ji demên kevînar va (zêdetirî 2500 sal berê), ji dema hatina

<sup>26</sup> Гаты Заратуштры. Перевод с авестийского, вступительные статьи, комментарии и приложения И. М. Стеблин-Каменского, Санкт-Петербург, 2009. С. 20.

<sup>27</sup> Дьяконов И. М., История Мидии, М. – Л., 1956. С. 152.

xwe ya vê herêmê va cînarên k'urdan bûne... (bi vê boneyê em careke dinê gotinên Strabon bi bîr bînin: "... *Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, bavpêşîyên (bapîr) kevneşopîyên ermenîyan, hê berî wan yên kevneşopîyên farsan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdarîya wan bûne di Asîyayê da...*")<sup>28</sup>. Û, ji bilî vê, wek ku li jorê jî hate gotin, *medan* dema serdarîya vî p'adişahê bêhemp'a û nebînayî *ax dane p'enaberên ermenî, ji bo ku ew têda cî û st'ar bibin, paşê jî heya r'êberê ermenîyan ê ciwan (Parûyr) t'acîdar kirne, û bi wê yekê bingeha dewleta ermenîyan hatye danîn*.<sup>29</sup>

Lêbelê, pîrsa hebûna navên cuda hê pêdivîya xwe bi dahûrandina (analîz) zanistî ya bêhtir k'ûr heye... – Mamosta Ezîz ê Cewo dinivîse û nirxandinên xwe yên zanistî didomîne, û pêşniyar dike, ku xwendevan bi xwe r'avekirin û têbînîyên wî yên cuda yên zimanzanî-êtîmolojî yên di derbarê hinek aspêktên lêger'inên vê mijarê da wat'edar bikin, ji bo ku bersivne heşmendî ji bo pîrsên p'ewendîdarî cudaxwendina nav û têrmînên têk'stên kevnar ên "Avêstayê" bibînin.

Û pêvajoya lêger'inan dide xuyan, ku pîrsgirêka sereke ya vê r'ewşa t'evlihev di r'ê-baza zanistî ya lêger'inên têk'stên P'irtûka Pîroz da ye.

Dema zanîyaran di warê nivîsarên *avêstayî* û yên li ser ber û zinaran nivîsî da lêger'in pêk anîne, ewana ne ku t'enê r'astêyên zimanê k'urdî li ber ç'avan negirtine, her çiqas, ew hemû jî li ser xaka K'urdistanê hatine dîtin, heya dema r'avekirina (deşîfrekirin) wan pîrsa hemberhevkirina matêriyalên nivîsarên kevnar bi yên zimanê k'urdî ra' hîç nehatye ber heşê wan jî. Û, ji bo ku nivîsarên kevnar ver'esînin, ewana serî li "derfetên" zimanê farsî dane, lewra ku, ew zimana t'imê "li ber destê" wana hebûye. – Mamosta dide zanîn û şiroveya xwe didomîne: – Ew jî wê demê, dema nivîsarên yekem ên *avêstayî* di *Medyayê* da hatine sêwirandin, peyhatîyên *medan* ên r'astêdêr jî *k'urd* bi xwe ne, û *zimanê k'urdî* jî, bi hemû zaravên xwe va, dûmayîya *zimanê medî* ye. Û, eger dema lêger'in û ver'esandina nivîsaran p'eyv û sazîyên zimanî yên wan bi yên *k'urdî* r'a di goveka hemberhevkirinî da analîz bikirana, cuda-xwendinên p'eyv û têrmînan dê kêmtir bûna...

Ma, xwe tiştê ku R'êçard Fray gotye, ne bê bingeh bûye: "... *di nivîsên li ser zinaran ên farsîya kevnar da têrmînên ji hêla wat'eya xwe va girîng hene, û şêwazên wana jî bêhtir medî ne, ne ku farsî, û ev jî wê destnîşan dike, ku ew ji hêla haxemenîyan va ji bakûr hatine wergirtin...* (ango, ji medan. –E. C.)"<sup>30</sup> – Wek prênîsîp, dîtineke weha ya zanîyarê amêrikî r'ast e, lê divê bê gotin, ku li vîra ne ku pîrs a hinek têrmînên wergirtî ye, lê ya nivîsarên li ser ber û zinaran bi giştî ye, lewra ku, nivîsar bi xwe bi *zimanê medî* hatine nivîsîn, ê ku her paşê, hê dereng, ji hêla zanîyar-lêger'inêran va wek "*farsîya kevnar*" hatye navkirin...

Hemû peykerên *çanda medî* yên nivîskî k'uda dikaribûn wînda bibûna? – Ma ne, zimanê r'êvebirina dewletê yê wê împêratorîyê *medî* bûye: bi wî zimanî bir'yarname, r'êvebername, ferman û beyanname û p'eyam hatine nivîsîn – di nav wan da wisa jî li ser ber û zinaran! Bi wî zimanî berhemên wêjeyî hatine afrandin û çand pêşk'etîye – çanda dewleteke gewre!

Û ev hemû nirx û hêjayîyana *çawa û k'uda* dikaribûn bê şop wînda bibûna – ew jî di navbera 20 – 30 salî da?

Ma ne, piştî ku Qurûş kalikê xwe ji ser t'ext diavêje jî, di bingeha împêratorîyê da hîç tişteke nayê guhar'tin: ne *sazîya r'êvebirîyê*, ne *ya dewletê*, ne *zimanê dewletê (medî)*, ne *art'êşa bi r'êkûpêk a bi hêz* û ne *jî ola dewletê (zerdeştî)*! Û ev hemû jî di nav sazîya Împêratorîya *Medyayê* da pêk hatibûne û şêwaz girtibûne. Û ev hemû ji Qurûş r'a wek mîrasekê mabûne (*ma ne, ew nevîyê p'adişahê Împêratorîya Medyayê bûye!*). – Her t'enê her'e û ji xwe r'a p'adişahtîyê bike!

Û, xwezayî ye, hemû peykerên kevnar, yên ku li van erd û aqaran hatine p'arastin, bi bingehîn ên *Medyayê* ne! Ev dewlet zêdetirî 120 salî wek împêratorî hebûye (û, kê-m-zêde,

<sup>28</sup> Страбон, География, XI книга, Москва, 1964, стр. 525. С. 525.

<sup>29</sup> Ezîz ê Cewo, "Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere?", Amed – 2017, rû. 64 – 68; û gotarên wî: "Lê ka, êdî rastî li ku ma?" – [https://amidakurd.net/ku/tekst/lê\\_k\\_a\\_êdî\\_r\\_astî\\_li\\_k\\_u\\_ma](https://amidakurd.net/ku/tekst/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma) û "Dilêma dîrokî, an îdêa fîks?" – [https://amidakurd.net/ku/tekst/dîlêma\\_dîrokî\\_an\\_îdêya\\_fîk\\_s](https://amidakurd.net/ku/tekst/dîlêma_dîrokî_an_îdêya_fîk_s)

<sup>30</sup> Ричард Фрай, Наследие Ирана, М. 1972. С.135.

ewqasî jî – nivserbixwe di nav *Împêratorîya Med û farsan* da), zimanê wê yê dewletê *medî* bûye, û hemû peykerên nivîskî bi wî zimanî hatibûne sêwirandin. Û lewra jî, piştî derbeya Qurûş jî evê împêratorîyê hê demeke dirêj nav û deng û serbilindîya pêşîyên xwe yên *medî* winda nekiribûye, her çiqas jî ew êdî wek *Împêratorîya Med û farsan* hatye navkirin.<sup>31</sup>

Û ji bilî van hemûyan, bi xwe *R'îçard Fray* jî, ji ku wan gotinên xwe yên li jorê t'omar bike, van gotinên Strabon tîne: “... *Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, bavpêşîyên kevneşopîyên ermenîyan, hê berî wan yên farsan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdarîya wana bûne di Asîyayê da...*”<sup>32</sup> –Û ev gotinana jî, qey bibêjî, ên ku li jorê hate gotin, tomar dikin.

Divê li vira her bê gotin, Strabon peyva ‘*kevneşopî*’ bi wat’eya ‘*çand*’ k’ar anye, bi wa-t’eya vê peyvê ya berfireh va... – Mamosta şirove dike û dane û delîlên balk’êş tîne û li ser bingeha dahûrandina wan (analîz) r’astîya dîrokî r’avedike. – Û, lewra jî, dema dibêjin, ku peykerên kevnar ên *zimanê medî* nehatine p’arastin, eger mirov nerm jî bibêje, *bêr’etîyeke zanistî* ye. Ji wê jî bêhtir, têrmînên “*farsîya kevnar*” an “*zimanê avêstî*”, yên ku li ber maseya nivîsarê hatine hinartin, *psêwdozanistî* ne (bi *zanistî lêp in*).

Di wê derbarê da, k’a ev têrmînana çawa p’eyda bûne, agahîyên balk’êş li bal zanîyarê sovêti S. N. Sokolov hane. Ew dinivîse, ku ...her t’enê du zimanên kevnar ên îranî di peykeran da hatine p’arastin û gihîştine me: *farsîya kevnar û avêstî*. “...*Yek ji wan, – ew dinivîse, – yê ku di nivîsarên bizmarî yên p’adişahên hexamanî yên li ser zinaran da hatye p’arastin (dewrên VI – IV ên berî s.m.) – yên Darîûs, Xşayarşa (K’sêrk’sês) û yên dinê, bêguman, zimanê dê yê wan p’adişahan bûye, yên ku ji herêma Pars (Pêrsîda, Farsa vê demê) bûne, ev jî destûrê dide, ku mirov navê zanistî yê “farsîya kevnar” li wî bike*”.<sup>33</sup>

Nêzîkbûneke weha ji k’u tê, ya ku, eger mirov nerm jî bibêje, dûrî heşmendîyê ye?!

Hemû “*delîl*” ên ji bo girtina “*bir’yareke*” weha – ku wî zimanî wek “*farsîya kevnar*” bihejmêrin – li ber hîç r’exneyekê jî xwe r’anagirin.

K’a, em binihêr’in, ji ber çi!

Bi r’astî jî, em hema bibêjin, ku *Darîûs, Xşayarşa (K’sêrk’sês)* û r’êvebirên dinê yên Împêratorîya post-Medyayî (pişt-Medyayî) ji herêma Pers jî bûne, ma, gelo, ev tê wê wat’e-yê, ku wê demê zimanê farsî yê nivîskî hebûye, û wana jî bi wî zimanî nivîsîne? Û, ji bilî wê, wek ku li jorê jî hate gotin, piştî bi xayîntî di *Medyayê* da t’ext û t’ac werger’andine jî, lê dîsa di wê dewleta gewre da hemû navnîşanên dewletê yên berê (yên *medî*!) hatine p’arastin, di nav wan da wisa jî zimanê dewletê –*medî*, hem jî zêdetirî du sedsalan ew dewleta wek *Împêratorîya Med û Farsan* hatye hejmartin.<sup>34</sup> Û, pirseke dinê ya ne kêr girîng jî: nivîsara bizmarî, a ku bi fermana Darîûsê I (s. 521– 485 ên berî s.m.) li *Bîsêl’ûnê*, li ser zinêr hatye nivîsîn, li navçeya başûr-r’ojhilatê *Êkbatana* p’aytexta *Medyayê* ye (*Hemedana* îroyîn – li *R’ojhilatê K’ur- distanê*).

Bi vê boneyê, gelo, k’îyê bikaribe bersîva van pirsan bide:

1. Ev nivîsarên li ser ber û zinaran çima li herêma Pers nehatine nivîsîn?

2. Ewana sîh salî pey derbeya xayînane ya Qurûşê II r’a dikaribûn bi k’îjan zimanî bihatana nivîsîn, ew jî wê demê, dema ew dewlet Împêratorîya Med û Farsan bûye?

Weha, gelo, bi zanistî (*bixwîne – bi heşmendî!*) çiqasî r’ast bûye, ku dema deşîfrekirina wan nivîsaran matêrîalên hemberhevkerinî yên zaravên zimanê *k’urdî* yên cuda k’ar neanîne? Û, bi giştî, çiqasî zanistî ye, ku wî zimanî, yê ku ew nivîsar pê hatine lêkirin, wek “*farsîya kevnar*” navkirine, ji ber ku piştî du hezar salan ew nivîsarana di nav sînorên dewleta farsan da hatine dîtin? Ango, dertê, ku bi heman heşmendîyê zimanê sernivîsarên kevnar ên yewnanî, yên ki li ser xaka T’irkîya îroyîn hatine dîtin, dikarin t’irkî nav bikin?

K’a, li vir heşmendî li k’u ye?

Bi heman şeweyî, wek ku dilê wan xwestye, hildane û zimanê *P’irtûka Pîroz* a

<sup>31</sup> Опарин А.А., Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997. С. 54 – 58;  
Страбон, География, XI книга, Москва, 1964. С. 524.

<sup>32</sup> РичардФрай, Наследие Ирана, М.,1972. С. 135.

<sup>33</sup> Соколов С. Н., Авестийский язык, М., 1961. С. 8.

<sup>34</sup> Опарин А.А., Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997. С. 54– 58.

zerdeştîyê “avêstî” navkirine. Weha, di wê derbarê da, k’a ew yek çawa pêk hatye, S. N. Sokolov çî nivîsye: “... *Avêsta r’êyeke dûr û dirêj derbaz bûye: di destpêkê da bi kevneşopîya zarkî, lê paşê bi ya nivîskî. Xala jêderî ya wê kevneşopîyê, ... mirov dişwar bikaribe derxe zanebûnê, û lewra jî, zimanê vê p’eykerê divê, bi mercî, zimanê Avêstayê, an jî “avêstî” bê navkirin...*”<sup>35</sup> – Hema wisa, bi destekî sivik û hêsan...!

Li ber ç’avan e, ku herdu têrmîn jî ( “*farsîya kevnar*” û “*zimanê avêstî*”) mercî ne û bingehê wan a zanistî nîne.

Bi dîtina me, pêwîst e, mirov carekê jî destnîşan bike: lewra ku “*Avêsta*” ji hêla *Zerdeşt P’êxember* va di *Medyayê* da hatibûye nivîsîn, û p’ir’anîya wan nivîsaran, ên ku li ser ber û zinaran hatine nivîsîn, di xaka *K’urdistanê (Medyayê)* da hatine dîtin, lewra jî, dê heşmendî bûya, eger hem dema deşîfrekirina *nivîsarên avêstî*, hem jî yên li ser ber û zinaran nivîsî, di r’êza matêrîalên zimanên îranî da, berê pêşin *r’êalîteya zimanê k’urdî* li ber ç’avan bihatana girtin, lewra ku *zimanê k’urdî* dûmahîka xwezayî ya *zimanê medî* ye.

Ji bilî vê, dê bi zanistî r’ast bibûya, eger di vê pêvajoyê da bi matêrîalên zimanên îranî r’a wisa jî yên *zimanê ermenî* bihatana k’aranîn, lewra ku, di vî zimanî da bi hezaran peyvên îranî hene, yên ku di demên cuda da *zimanê ermenî* ji *zimanên îranî* wergirtine, û gelek ji wana ne di p’ehlewî da û ne jî di *farsî* da nehatine p’arastin. Û p’ir’anîya wan p’eyvana di *zimanê ermenî* da bi şêwazê xwe yê r’esen va hatine p’arastin (*Hraçya Aç’ar’yan* navnîşa 1405 p’eyvên wisa tîne), ji ber wê jî, heya nîveka salên pêncîyî yên dewra bihurî ermenî wek yek ji *zimanên k’oma îranî* hatye hejmartin.<sup>36</sup>

Û, bi vê boneyê – dîtinek jî: dema zanîyaran di derbarê p’eyvên îranî yên di *zimanê ermenî* da axivîne (û îro jî diaxivin), mabesta wan bi bingehîn *zimanên p’ehlewî û farsî* bûne. Lêbelê, *zimanê ermenî* di dîrokê da pêşîyê di nava goveka bandorîya *çanda medî* da pêşva çûye, û her paşê çanda p’ehlewîyan p’eyda bûye. Û çanda p’ehlewî bi xwe jî, di nava goveka çanda medî ya giştî da sêwirye û pêk hatye. Û, wek ku tê xuyan, eger mirov lêger’inên êtîmologî pêk bîne, dê derê holê, ku beşê mezin ê bi hezaran van p’eyvan ji *medî (k’urdî)* hatine wergirtin, û her ji wana beşekî biç’ûk dikare yên *farsî* bin. Li vîra, dibe ku di cîh da be, eger mirov careke dinê gotinên *Strabon* bi bîr bîne, yên ku *R’îçard Fray* di p’irtûka xwe da anîbûne: “... *Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, bavpêşîyên kevneşopîyên ermenîyan, hê berî wan yên farisan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdarîya wana bûne di Asîyayê da* ...”<sup>37</sup>

Dema mirov herç’ê ku li jorê hate gotin t’omar dike, dertê hole, ku:

a) her çiqas di zanista dîrokî da dîtînen dyar ên kevneşopî di derbarê dîroka *Medyayê, Împêratorîya Med û farsan û p’ehlewîyan* da çê bûne jî, lêbelê lêger’inên zanistî yên serdemên cuda yên dîrokê didin xuyan, ku:

– piştî derbaya xayîname, ya ku ji hêla *Qurûşê nevîyê p’adişahê Medîyayê*, satrapê fars (*Qurûşê II* ê dihatûyê) û malmezinên medî va pêk hatibûye, *Împêratorîya Med û farsan* derk’etîye ser sehneya dîrokê, ya ku li ser bingeha *Împêratorîya Medyayê* û bi kevneşopîyên wê pêk hatye û pêşketîye;

– *Împêratorîya Med û farsan*, a ku wisa jî, wek *Împêratorîya hexamanîyan* tê zanîn, û heya êrîşa *Îskenderê Makêdonî* (s. 331-ê ya berî s.m.) hebûye, bi sazîya xwe ya dewletê û şêwazê r’êvebirîya xwe va dûmahîkya *Împêratorîya Medyayê* bûye;

– *Qurûşê II* bi xwe, û gelek nûnerên binemala *hexamanîyan*, wek r’ayedarên dewletê, di nava sazîya *Împêratorîya Medyayê* da, li ser bingeha çanda medî gihîştine û pêk hatine;

– hemberhevîkirin û nîrxandinên zanistî yên zanîyarîyên dîrokî didin xuyan, ku *Zerdeşt P’êxember med* bûye, ew di nava derdorê nêzîkî qesra p’adişê da gihîştîye, lewra ku ew bi xwe ji binemala mogan (r’ahîban) bûye,<sup>38</sup> û berî dyarbûna *zerdeştîyê* di *Medyayê* da mîrik

<sup>35</sup> *Соколов С. Н.*, Авестийский язык, М., 1961. С. 10.

<sup>36</sup> *Անտաշյան Հր., Հայերեն արմատական բառարան, հատոր I, Երևան. – 1979. Էջ 663; Անտաշյան Հր., Հայոց լեզվի պատմություն, II հատոր, Երևան, 1940. Էջ 218 – 225.*

<sup>37</sup> *Ричард Фрай*, Наследие Ирана, М, 1972. С.135.

<sup>38</sup> Гаты Заратуштры. Перевод с авестийского, вступительные статьи, комментарии и

bi xwe jî di heman demê da mog (r'ahîb) bûne.<sup>39</sup> Lewra jî, wek ku tê xuyan, p'êwendîyên wî yên nêzîk bi malbata p'adişê û *Kavî Viştaspa* bi xwe r'a hebûne...

– *Zerdeşt P'êxember "Avêsta"* di *Medyayê* da bi zimanên *medî* afirandye, li wira jî erk'a xwe ya p'êxemberîyê pêk anîye, û li wira jî *zerdeştî* bûye ola dewletê; di vê derbarê da daneyek di derbarê kevneşopîyên dîrokî da heye, ya ku dibêje, ku *Medya* di dewr û zemanên kevnar da di *jîyana siyasî, êkonomî û çandî da xwedî cîyekî berbiç'av bûye û li ser xaka wê zerdeştî bi berfirehî belav bûye*.<sup>40</sup> Û, dibe ku, lewra jî di wê derbarê da di *Gatan* da nehatye gotin, k'a welatê *Zerdeşt* li k'u bûye û navê wî welatî, yê ku *Kavî Viştaspa* p'adişahtî lê kirye, çi bûye, *lewra ku, yên ku guhdarîya Gatan kirine, ne ku t'enê ew welata baş dizanibûne, lê wisa jî di wî welatî bi xwe da bûne*...

– anegorî lêger'inên zanistî, *Zerdeşt* erk'a xwe ya p'eyamdarîya *ola r'astîyê* dema serdarîya p'adişahê *Medîyayê* pêk anîye, yê ku, anegorî demnûsiya kevneşopî (k'ronologî), navê xwe *Ûvaxşatra (Kîaksar)* bûye;

**b)** bi derk'etina zanîyarîyên nû yên di derbarê hinek r'astîyên dîrokî da, yên ku heya naha ji hêla zanîyanan va ji bo vê mijarê nehatibûne k'aranîn, ji bo lêger'inên nû derfet çêbûne, û li ser bingeha wan lêger'inan ev dîtinan derk'etine holê:

– ew, ku di "*Avêstayê*" da p'adişahê *Medyayê* û piştovanê *Zerdeşt P'êxember* wek *Kavî Viştaspa* tê bîranîn, û di ç'avkanoyên kevnar ên ermenîyan da hem *medan* (di nav wan da, wisa jî, *Îştîvêgûyê* p'adişahê wan), hem jî *k'urdan* wek peyhatîyên *Viştaspa* bîranîne (li jorê binihêr'in!), delîla wê yekê ne, ku navê wî p'adişahî yê kesî (yê ku malbatê lê kirye, û ew bi wî navî mezin bûye) *Viştaspa* bûye; lê ew di demnûsiya kevneşopî da wek *Ûvaxşatra / Xvaşatra* (yewn. *Kîak'sar*) hatye bîranîn, û ev jî ji bo wê serdemê tiştekî xwezayî bûye: wê demê, dema kesek ji bo p'adişahtîyê t'acîdar kirine, navekî dinê yê padşahtîyê li wî kirine, û ew nav ji bo wî kesî bûye *navê wî yê desthilatdarîyê, û ew kes bi wî navî di cîhanê da wek p'adişah hatiye naskirin. Û di vê derbarê da li bal Dyakonov agahîyên pêbawer hene. Ew dinivîse, ku nayê zanîn, k'a, gelo Hexamenîyên pêşin navên xwe yên kesî yên ji navên desthilatdarîyê cuda hebûne, yan – na*.<sup>41</sup>

Eger mirov herç'ê ku hatye gotin, t'omar bike, dikare bibêje, ku *Viştaspa* navê kesî yê p'adişahê *Medyayê* bûye, ku ew bi wî navî di jiyana malbatî û derdorên nêzîk da hatye naskirin, lê navê wî yê duyem: *Ûvaxşatra / Xvaşatra / Kîak'sar*, navê wî yê p'adişahtîyê bûye – yê ku dema t'acîdarkirinê lê kirine.

Û hinek dîtinên dinê jî – di derbarê wê dîroka t'evlihev da:

– ew, ku navê p'adişahê *Medyayê*, piştovanê *Zerdeşt P'êxember* hem di "*Avêstayê*" da, hem jî di nivîsarên p'ehlewî da wek *Kavî Viştaspa* tê bîranîn, lê di ç'avkanîyên farsîya navîn da, wek *Goştasp / Gûştasp* derbaz dibe, dibe bingehe, mirov bibêje, yan ew encama hewlên wan nivîsyarên dîrokê yên fars bûye, yên ku di xizmeta qesrê da bûne, yanê jî, dîsa li vir pîrsgirêka deşîfrekirin û xwendina nivîsên p'ehlewî li holê ye...

– Di nava k'urdan da *Viştaspa* wisa jî wek *Key Aksar* tê zanîn (di yewnanî da – *Kîaksar*) û ew nav bi r'eha wî ya *Keyanîyan* tê şirovekirin;<sup>42</sup>

– p'eyva *Ûvaxşatra / Xvaşatra*, ya ku di dîrokê da wek navê *Viştaspa / Kîaksar* tê bîranîn, wek ku tê xuyan, peyveke *medî* ye û p'êwendîya xwe bi têngîna *p'adişah* r'a heye.

Ev p'eyv û ya farsîya kevnar (zimanê *medî*) a *xšāyaθiya / xšayatiya* – p'adişah û ya hindî ya *kšatra / kṣatra* – xarozma desthilatê, bi êtimolojî digihîjin hev; wisa jî, wan p'eyvan hemberî p'eyva farsîya kevnar (*medî*) a *Xšayārša / Xšayarša* – navê *Xšayaršayê I – Ksêrksê I* bikin, ê ku p'adişahê pêncem ê hexemenyan bûye.

Mirov li vira dikaribû çî bigota?

приложения И.М. Стеблин-Каменского, Санкт-Петербург, 2009. С. 20 – 21.

<sup>39</sup> Дьяконов И. М., История Мидии, М. – Л., 1956. С. 416.

<sup>40</sup> Большая советская энциклопедия, БСЭ, Москва, 1969 – 1978. С. 212.

<sup>41</sup> Дьяконов И. М., История Мидии, М. – Л., 1956. С. 49

<sup>42</sup> Ekrem Cemil Paşa, Dîroka Kurdistan bi kurtebirî, Bruksel, 1995, r'û. 231 – 234.

Gelo ji me r'a li hev hat, ku em bersîva hemû pîrsan bidin? Helbet, na!

Eva her t'enê gavek a bç'ûk e – li ser r'êya r'onîkirina r'ûpelên “windabûyî” yên dîroka jîyana *Zerdeşt P'êxember*, erk'a wî ya p'eyamdarîyê û ya piştovanê wî – *Kavî Vîştaspayê* p'adi-şahê Medyayê yê nebînayî û bêhemp'a, yê ku di dîroknûsîya (k'ronologî) kevneşopî da wek Kîak'sar / Ûvaxşatra / Xvaşatra tê zanîn.

Ji vir û pêva gotin a pîsporan e. Û her bi hev r'a, bi hewlên hevbeş, mirovê bikaribe wan r'ûp'elên dîrokê yên tarî r'onî bike, yên ku benda dema xwe ne.

Û ev jî ne hemû ye.

Di p'irtûka mamosa Ezîz ê Cewo Mamoyan a “Zerdeşt P'êxember. R'ûpelên dîroka “windabûyî” ...” da (*Мамоян А. Д.*, “Пророк Заратустра. По страницам «потерянной» истории...”) wisa jî di derbarê têk'ilîyên dîrokî yên zerdeşrîyê û gelê k'urd da, di derbarê dengeveger' û şopên wê bîrûbawerîya kevnar di nava k'urdên îroyîn û gelek tiştên dinê da zanîyarî û daneyên balk'êş hene ...

## Ç'AVKANÎ

Алберт Олмстед, *История персидской империи*, Москва, 2012 г. // Albêrt Olmstêd, “Dîroka Împêratorîya farsan”, Moskova, s. 2012;

Большая советская энциклопедия, Т. 16, Москва, 1969–1978 г. // Êntsîklopêdiya mezin a sovêti, Moskova, s. 1969 – 1978.;

Гаты Заратуштры, Пер. с авестийского, вступительные статьи, комментарии и приложения И. М. Стеблин-Каменского, Санкт-Петербург, 2009 г. // Gatên Zardeşt. Wergera ji zimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek ên Î. M. Stêblîn-Kamênskî, Sankt-Pêtêrbûrg, s. 2009.;

Геродот, *История* // Hêrodotos, “Dîrok”.

Дьяконов И. М., *История Мидии*, М. – Л., 1956 г. // Dyakonov. Î. M., “Dîroka Medyaûyê”, Moskova – Lênîngrad, s. 1956.;

Исмет Конак, “Зороастризм и мидяне (интервью)”, – [https://www.academia.edu/68077406/Зороастризм\\_и\\_мидяне\\_%20интервью\\_](https://www.academia.edu/68077406/Зороастризм_и_мидяне_%20интервью_) // Îsmet Konak, Zerdeştî û ên med – [https://www.academia.edu/87917739/Zerdeştî\\_û\\_ên\\_Med\\_hevpeyvîn\\_](https://www.academia.edu/87917739/Zerdeştî_û_ên_Med_hevpeyvîn_) ;

Мамоян А. Д., “Пророк Заратуштра. По страницам «потерянной» истории...”. Москва – 2020 [https://www.academia.edu/62069668/А\\_Д\\_МАМОЯН\\_ПРОРОК\\_ЗАРАТУШТРА\\_ПО\\_СТРАНИЦАМ\\_ПОТЕРЯННОЙ\\_ИСТОРИИ](https://www.academia.edu/62069668/А_Д_МАМОЯН_ПРОРОК_ЗАРАТУШТРА_ПО_СТРАНИЦАМ_ПОТЕРЯННОЙ_ИСТОРИИ) // Li jêrê binihêr’in: Ezîz ê Cewo, “Zerdeşt Pêxember. Rûpelên dîroka «windbûyî»;

Мамоян А. Д., “Армянский богослов начала XX века об эздиян и эздянстве” – <http://kurdistan.today/armyanskij-bogoslov-nachala-xx-veka-ob-ezdian-i-ezdianstve/> // Li jêrê binihêr’in: Ezîz ê Cewo, “Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da”...;

Мамоян А. Д. “Где же историческая правда?” – [https://kurdistan.ru/2013/06/10/articles-19054\\_Gde\\_zhe\\_istoricheskaya\\_prawda.html](https://kurdistan.ru/2013/06/10/articles-19054_Gde_zhe_istoricheskaya_prawda.html) // Li jêrê binihêr’in: Ezîz ê Cewo, “Lê k’a, êdî r’astî li k’u ma?...”;

Мамоян А. Д., “Историческая дилемма или идея фикс?”, <http://kurdistan.today/?p=20739>. // Li jêrê binihêr’in: Ezîz ê Cewo, “Dîlêma dîrokê, an îdêa fîks?”;

Мирча Элиаде, *История веры и религиозных идей*, Т. I, Москва, 2002 г. // Mîrça Êlîadê, “Dîroka olan û hizra olî”, berga I, Moskova, s. 2002.;

Мифы народов мира: энциклопедия, Гл. ред. С. А. Токарев, Москва, 1980 г. // Mîfên gelên cîhanê (Êntsîklopêdî). Êdîtorê sereke Tokarêv S. A., s. 1980.;

Опарин А. А., *Всемирная история и пророчества Библии*, Харьков, 1997 // Oparîn A. A., “Dîroka hemcîhanî û gotinên pêxemberane yên Êncîlê”, Xarkov, s. 1997.

Ричард Фрай. *Наследие Ирана*, Москва, 1972 г. // Rîçard Fr’ay, “Mîrasa Îranê”, Moskova, s. 1972.;

Соколов, С. Н., *Авестийский язык*, М., 1961 г. // Sokolov S. N., “Zimanê avêstî”, Moskova, s. 1961.;

Страбон, *География*, кн. XI., Гл. XIII., П. 9. // Strabon, “Erdnîgarî”, Moskova, s. 1964.;

*Энциклопедический Словарь Ф. А. Брокгауза и И. А. Ефрона*, СПб, 1890–1907 г. // Ferhenga êntsîklopêdî ya F. A Brokhaûz û Î. A. Yêfron, Sankt-Pêtêrbûrg, s.1890 – 1907.;

Ekrem Cemîl Paşa, *Dîroka Kurdistan bi Kurtebirî*, Bruksel, 1995.;

Ezîz ê Cewo, “Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da” – [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ezdazanê\\_ermenî\\_yê\\_destpêka\\_sedsala\\_xx\\_di\\_derbarê\\_êzdîyan\\_û\\_êzdîtîyê\\_da](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ezdazanê_ermenî_yê_destpêka_sedsala_xx_di_derbarê_êzdîyan_û_êzdîtîyê_da)

Ezîz ê Cewo, “Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere?”. Amed, 2017. // *Azûz* 9

Джаво, Эздианство: Где надо искать правду о нём? Амад, 2017 г.;

Ezîz ê Cewo, “Dîlêma dîrokê, an îdêa fîks?” – [https://amidakurd.net/ku/tekst/dîlêma\\_dîrokê\\_an\\_îdêya\\_fîk\\_s](https://amidakurd.net/ku/tekst/dîlêma_dîrokê_an_îdêya_fîk_s)

Ezîz ê Cewo, “Lê k’a, êdî r’astî li k’u ma?...” – [https://amidakurd.net/ku/tekst/lê\\_k\\_a\\_êdî\\_r\\_astî\\_li\\_k\\_u\\_ma](https://amidakurd.net/ku/tekst/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma)

Ezîz ê Cewo, “Zerdeşt Pêxember. Rûpelên dîroka «windbûyî» ...”. Ankara, weşanên Aryen, s. 2018. – [https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT\\_PÊXEMBER\\_RÛP\\_EL\\_ÊN\\_ÎROKA\\_WINDABÛ\\_YÎ](https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT_PÊXEMBER_RÛP_EL_ÊN_ÎROKA_WINDABÛ_YÎ) ;

Արմինյան Խ. Երկերի լիակատար ժողովածու, ութ հատորով, ութերորդ հատոր. – Երևան, 1958 թ. // X. Abovyan, Berevoka t’am a berheman, berga heystem, Yêrêvan, s. 1958.;

Անադյան Հր., Հայերեն արմատական բառարան. Հատոր Դ. – Եր., 1979 // Aç’ar’yan Hr., Ferhenga êtîmolêgî ya binaxeyên zimanê ermenî, berga 4-em, Yêrêvan – s. 1979;

Անադյան Հր., Հայոց լեզվի պատմություն, Կ հատոր, Երևան, 1940 թ. // Aç’ar’yan Hr., Dîroka zimanê ermenî. Berga A, Yêrêvan, s. 1940.;

Արիստակես Տեղկանց. Հայերգ. – Թիֆլիս, 1882 թ. // Arîstakês Têvkant’s, Hayyêrg, Tîflîs, s. 1882.;

Հայաստանի Մատենադարան. XVI դարի ձեռագիր № 1495, էջ.էջ. 142ա և 142բ // Matênadarana Ermenîstanê, Înstîtûta destnivîsarên kevnar, destnivîsara sedsala XVI, № 1495, r’. 142a û 142b.;

Մովսես Խորենացի. Հայոց պատմություն. – Երևան, 1991 թ. // Movsês Xorênatsî, “Dîroka Ermenîstanê”, Yêrêvan, 1991; têbînîyên r’ûsî ji weşana wê ya r’ûsî: Мовсес Хоренаци, «История Армении», Издательство «Айастан», 1990.;

Տէր-Մանուկեան Ս. Վ., Եզիդի կուրմանժ, Ախալցխա, 1910 թ. // Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan, “Kurmancên yêzîdî”, Axalt’sxa, 1910.

---

Wergera ji r’ûsî – ya malp’er’a “AmidaKurd”.

Weşana gotarê ya bi zimanên r’ûsî li vira ye: [https://www.academia.edu/104840278/Происхождение\\_зороастризма\\_Теория\\_Азиз\\_э\\_Джаво\\_Мамояна](https://www.academia.edu/104840278/Происхождение_зороастризма_Теория_Азиз_э_Джаво_Мамояна)

---